Çîrokên Bijartî yên Cîhanê

# Çîrokên Qozeqerê



*dipnot

**ÇÎROKÊN QOZEQERÊ**

dipnot yayınları

**Çîrokên Qozeqerê**

Weşanên Dipnot: 168
Kitêbên Zarokan: 33
Çap 2013 / Ankara
ISBN978-605-4412-87-7
Sertîfîqa No: 14999

*Wergêra Kurdî:* Firat Kelehkî
*Berg:* Ekber Yıldız
*Wêneyê Bergê:* Petra Rau

*Amadekariya Berî Çapê:* Dipnot Bas. Yay. Ltd. Şti
*Çap:* Mattek Matbaacılık Bas. Yay. Tan. Tic. San. Ltd. Şti.
Ağaç İşleri San. Sit. 1354 Cad. (21.Cad.) 1362 Sok. No:35
İvedik/ANKARA-Tel: (0312) 433 23 10

**Weşanên Dipnot**
Selanik Cad. No. 82/24 Kızılay / Ankara
Tel: (0 312) 419 29 32 / Faks: (0 312) 419 25 32
e-posta: dipnotkitabevi@yahoo.com
www.dipnotkitap.com

# Çîrokên Qozeqerê

## Çîrokên Bijartî yên Cîhanê

*Wergêra Kurdî*
Firat Kelehkî

*dipnot yayınları

# NAVEROK


BAVÊ ROJ Ê MAFNAS/Çin ........................................................7

KURÊ SABÛNFİROŞ/Îranê ........................................................ 11

ÊZİNGFİROŞ/Filistînê ........................................................ 19

ROVÎ Û NANÊ BİÇÛK (Sewik)/Skoçya ..................................... 25

MASİYÊ BİSÊHR Ê ZÊRÎN/Skandinawya ................................. 27

ŞÎVA ROJ, HEYV Û BA/Hindê ................................................ 35

SÊVÊN XORTANİYÊ/Rusya ..................................................... 39

DARA Lİ BİN XEWN TÊN DÎTİN/Brezîlya ............................ 55

GULA ÇOLÊ YA BİÇÛK/Romanya ........................................... 61

ZAROKÊ Jİ WELATÊ KİNİKAN ZÎVİRİYE/Brîtanya ........... 69

KÎSO Û KOVÎ/Kurdî .............................................................. 73

ÊZİNGÊN MİN/Kurdî ............................................................. 75

TU DİKARÎ QAZÊ BİPİRTİKÎNÎ/Tirkî ................................... 77

NOKA ŞİKESTÎ/Tirkî ........................................................................ 81

AQİL Û BEXT/Bulgarê ...................................................................... 91

AGİR DİZÎNA XALMİŞK/Meksîka ..................................................... 97

DUDİLİYA XALMİŞK /Meksîka ......................................................... 97

GURÊ ÇOLÊ MİROVÊ SPÎ DİXAPÎNE/Bakurê Amerîka ... 103


# BAVÊ ROJ Ê MAFNAS

Fang Yigun

Bavê Roj, her sibeh rûyê xwe pêşanî hemû mirovan dide, bêyî ku ferqê bixe navbera dewlemend –hejar, bihêz-bêhêz, ciwan-pîr, hemû bi şewq û germiya xwe hembêz dikirin.

Her roj bi rêzê serdana hemû cihan; çiya, derya, çem û rûbar bi kurtî her derekê dikir. Giya, çayir û çîmenan di hembêza germ ya Bavê Roj de bejin didan, şîn dibûn. Kulîlk di bin şewq-ronahiya wî de xweşik dibûn û roj bi roj kêfxweş dibûn. Ajelan di bin germiya wî ya ku dida derdorê de digeriyan û dilxweş dibûn. Balindeyan li ber ronahiya wî erd dikolan û xwe di nav de digevizandin.

Rojekê rêwiyek ji bo ku bêhna xwe berde, li ser kevirekî li kêleka rê rûnişt, şifqa xwe danî û ji xwe re bi dengekî bilind fikirî: “Tu çiqas germ î Bavê Roj! Her kesekî li cîhanê para xwe ji te werdigire, tu qet ferqê naxê navbera tu tiştan û hemûyan bi germî hembêz dikî!”



Bavê Roj, dema ev gotinên rêwî bihîstin, berê xwe da keçika Ba ya li cem xwe û jêre got; “Te bihîst ne weha? Ez di cîhanê de mafnastir kes im, hemû kes wiha dibêje.”

Keçika Ba, bersiv neda. Piştî demekê axek kişand û got; “Belê, ez dizanim. Tu hewl didî ku her wext mafnas bî, şewqa-ronahiya

xwe wekhev belav bikî. Lê belê, her kesekî li ser zeviyê bi awayekî yeksan-wekhev ji germahiya te sûd wernagire. Mirovên wiha hene çavê xwe diberdin jiyana ajelên dirinde û balindeyên ku li nav daristanan dijîn. Ev ajel azad in, dema bixwazin dikarin werin bikevin jêr baskên te yên germ. Tu dizanî, ji ber ku ez li hemû cîhanê digerim, li jêr çi diqewime agahdar im û tiştek ji ber çavên min baznade."

Keçika Ba jê re got "Temaşe bike" û cîhana jêr pêşanî da; "Li vê derê bajarekî mezin heye. Bi hezaran balexaneyan-avahiyên mezin ezman girtine. Ne dereke vekirî, ne meydanek. Her der tejî balexaneyên pir qatî ne. Loma ew şewqa te ya xweşik nagihije her kesekî û kêm kes jê îstîfade dikin. Belê, li vê derê yek-du bistan û bexçe hene, lê ew jî milkên taybet in. Bê destûra xwediyên wan kes nikara here nav wan.

"Fermo vaye di qeraxa golê de, bi dîmenên xwe nexweşxaneyeke pir xweşik; li derdorê hewayeke bê çiqas pak û paqij! Wek beşek ji tedawiya pizîşkî tu dibînî bê zarokan çawa xwe daye ber tavê? Evna hemû zarokên dewlemendan e."

"Niha jî berê xwe bide aliyê din yê bajêr, bi dehezaran mirov di van xaniyên biçûk û kavil de dijîn. Tu wî zarokê jar û bêhal ê ku di odeya xwe ya gelekî biçûk de xwe dirêj kiriye dibînî? Ew zarok gelekî nexweş e; divê hewaya paqij werbigire û derkeve ber tavê. Lê berê odeya wî/ê li bakur e, di dîwar de jî pencereyeke biçûk heye, dê tava te çawa bigihije vê zaroka pepûk?"

"Temaşe bike li wir melevangeheke mezin heye. Jin û mêr di wê ava pak a ku te germ kiriye de melevaniyê-sobayiyan dikin.

Hinekan xwe dirêj kiriye û li ber wê germa ku te belav kiriye kêfa xwe dikin. Evên han hazirxwer û mirovên berdoş in."

"Niha jî berê xwe bide vê kargehê ku dûmaneke pîs jê bilind dibe. Di hundir de karker hewayeke pîs dikşînin-dimijin, di wan atolyeyên-kargehên tarî de qet tîrêjeke rojê nabînin. Ew destê te yê germ qet nagihe wan. Bavê Roj, ew sibehan hê zû hê ku tu derneketiye diçin ser kar. Êvaran jî dema westiyayî tên ji xwe tu ji mêj ve çûyî."

Vêca, te dît; hewqas mirovên ku pêdiviya wan bi şewq şû germiya te hene ku... Lê te pişta xwe daye wan."

Keçika Ba xwest bibêje "Niha jî li vêderê binêre..." lê Bavê Roj, gotina wê birî û got; "Bes e! Min fam kir ku ji ber ez li jor sekinîme, nabînim bê ka li jêr hinek mirov çi êş û janan dikşînin. Te çavên min vekirin. Hat xwiyakirin ku ez ne mafnasekî wiha me başiya herkesî bixwazim, û şewqa xwe bi awayekî yeksan bi ser her kesekî de belav bikim."

*Îllüstrasyon: Ding Cong*

ജ ഌ

## KURÊ SABÛNFİROŞ

Wexekî di serdema Împeretoryeta Îranê de, li bajarê Meşhed bi navê Ebdulla miroveki hejar lê dilfireh û çavtêr hebû. Sabûn ji xwe re çêdikirin û difirotin, bi hatina wan bi zorê debara malbata xwe dikir. Ji serê sibehê bi derketina tîrêjên rojê re heta êvarî roj diçe ava li kuç û kolanên bajêr digere û dibêje; "Birayên min werin ji van sabûnên min ên resen bikirin! Hemû kes dizane ku, sabûnên wek yên min nînin. Ger bikarîna biaxifin dê zarokan jî ev rastî piştrast bikira."

Lê dema mirov ji nêzîk ve berê xwe bidayê, didît ku her naşibihe sabûnê; reş wek qetranê, mezin mîna daran. Miroveki bi xeletî yek jê bikiriya û dest û rûyê xwe pê bişûşta, çermê wî wek agir pêkeve dişewitî. Lê ya baş ew bû ku zêde nedihatin firotin: Ji ber li Îranê ji bo paqijiyê û şûştina cilan jî gel zêde sabûn bikarnedianî. Ji bo şûştina firaxan jî zêdetir qum bikardianîn. Loma Ebdullahê bedbext her roj li kuç û kolanan digere, lê nikare têra

xwe û kurê xwe yê biçûk Ehmed pereyan bidest bixe daku xwarinê ji xwe re pê bikirin.

Rojek ji rojan li ber xaniyê xwe ji kerpîçan rûdine, dibîne ku kurê wî ji nêza digirî, ji bo ku rondikên çavê kurê xwe nebîne, destê xwe dide ber çavê xwe û xemgîn xemgîn difikire ka çi bike. Kurê wî yê ku êdî deh salî ye, rewşa bavê xwe dibîne û jê re dibêje; "Bêxem be yabo! Tu sibe ji yên hefteyekê zêdetir sabûnê bifroşî." Ebdulla, berê xwe dide kurê xwe yê rûpak û çav bi hêvî û serê xwe dihejîne.

Herweha roj derbas dibin, lê rewşa wan hê xerabtir dibe. Tam di van rojan de Ehmed dikeve nav macerayeke biçûk. Rojekê dîsa radibe hêdî hêdî diçe dibistana xwe. Dinya gelekî germ e, Ehmed li ber çem li bin siya darekê rûdine, hem dixwaze hinekî xwe ji tîrêjên rojê biparêze û hem jî bêhna xwe vede.

Li ber çem, jin cilên xwe dişon û sîtilên xwe tejî av dikin. Li enîşkeke din çend deveh li ser çem avê vedixun, çend ker di nav avê de xwe hênik dikin. Li cihekî din çend hosta cilên ku boyaxkirine dişon. Boyaxa cilên ku nû hatine boyaxkirin tevlî avê dibe û diçe.

Ehmed dike ku rabe, dibîne derwêşekî ku şêrekî zincîrkirî pêre ye nêzikî wî dibin; Li cem derwêş jî çend kesên bi cil û kumên ecêb hene, hemû bi hev re dibêjin; "Rê bidin Şah, berê xwe jî bidin dîwar." Li pey wan jî Şah, li hespekî Ereb sware û xuya dike, li derdora wî jî esker hene. Li dû wan jî textê rewan li ser pişta çar hêstiran hatibû bicîhkirin, derdora text bi leşkeran hatibû dorpêçkirin û dihatin.

Dema qelebelix digihe ba Ehmed radiwestin, ji textêrewan prensesek peya dibe. Tê famkirin ku dixwazê li zîvên neqişandî yên bi nav û deng ên Meşhedê binêre. Prenses dema dikeve dikanekê di dikanê de gengeşiyek derdikeve. Deng, qêrîn û hewar bilind dibe. Li wê derê şêr ji zincîra xwe difilite, wek harbûye êrişî derdorê dike. Mirov direvin, zarok digirîn, jin hewar dikin, dengê hespan jî tirs û gengeşiyê zêdetir dike. Tirs û tevlîheviyeke zêde çêdibe.

Hemû ev tiştên han di kêliyekê de dibin. Di vê gengeşiyê de şêr xwe davêje prensesê, prenses dikeve, jiyana wê dikeve metirsiyê. Ehmed dema vê dibîne, dikeve dikaneke hesingeriyê. Hesinekî sor ji ser agir radike û tîne li şêr dide. Dema şêr birîndar dibe prensesê bicîh dihêle û dikeve nav bazarê, ji ber êşa canê xwe dikeve çi cihekî dişkîne û belav dike. Lê prenses difilite. Dema tirsa wê derbas dibe bangî Ehmed dike. Ehmed tê cem, prenses bo wêrekî û rizgarkirina xwe spasiya wî dike û ji peywirdarekî re jî dibêje ku kîsikek zêr bidin wî lawikî. Ehmed heta wî temenê xwe tiştekî wa xweşik neditibû. Zêrên xwe werdigre, zimanê wî tê girtin, ji şerm û kelecanê nikare spasiya prensesê jî bike.

Bav û kur zemanekî bi zêrên ku prensesê dane wan debara xwe dikin. Lê, pere yan zêrên ku her ji wan diçe û tiştek nayê ser wan têra çi dikin! Ew dîsan hejar dibin û dikevin derdê jiyanê. Di wê demê de rastî bazirganekî gerok ê cuhî dibin. Bazirgan ji wan re pêşniyar dike ku herin li paytext sabûnên xwe bifroşin. Paytext gelek dûr e, rê jî metirsîdar e. Lê Ehmed cesaretê dide

bavê xwe û dibêje; "Ji dêlva ku em li vir dimrin, bila em di rê û çolan bimirin."

Bi vî awayî dikevin rê. Carna di ser çiyan û rêyên biçûk re, caran jî di çolên bêav re derbas dibine. Diwestin, lingên wan diwerimin, diêşin, tî dibin, birçî dibin. Li aliyê din jî, tirsa rêgiran dikeve dilê wan. Ji bo ku zêde tî nebin û xwe ji rêgiran biparêzin, bi şev di bin ronahiya tava heyvê re diçin, bi roj radiwestin û di şikeftan de radizin. Her çiqas tava heyvê be jî lê her dema ku li derekê siyekê dibînin tirsa rêgirên swar dikeve dilê wan. Di rê de ji yên ku bi hêstiran rêwitiyê dikin re dibin alîkar û ew jî hinek xwarin didin wan, bi wê xwarinê tenê dikarin zikê xwe nîvtêr bikin.

Bi wî awayî bi şev çûn û roj raketinê digihin ber rubarêkî. Dixwazin di ser pira li ser rubar re derbas bibin. Lê dibînin ku ewrên giran ezman dagîr kirine û xwiş xwişa baranê ye. Baran hewqasî zêde hat ku av rabû û ew jî hemû şil bûn. Ji neçarî xwe dan ber latekê. Bayekî sar dihat, ew jî ji serma diricifin. Ji ber ku rêya xwe jî wenda kiribûn, mabûn li benda însafa ajelên kovî.

Dema ku ba sekinî, di taritiya şevê de nalînek hat. Bav ji Ehmed re dibêje; "Bêdeng bisekine! Ev 'pîremêrê çolê' ye."

Ehmed ji ber heta wê rojê navekî wek Pîremêrê Çolê nebihîstibû, qet natirse, guh jî nedabavê xwe, ji cihê ku lê ye radibe û ber bi cihê nalîn jê tê diçe. Dema zêde nêzikî dibe, heyva ku heta niha di bin ewran de xwe veşartibû yekser derdikeve; Ehmed jî rûbirûyê derwêşekî kal dibe ku li ser qumê rûniştiye. Sekoyekî ji çermê Leopar avêtiye ser mile xwe, di destekî wî de darekî qalin ê

ser bizmarkirî, di destê din de jî kodikeke ji kundir heye ku perêyên xelkê didanê dixistinê.

Derwêş dema Ehmed dibîne dinala û dibêje; "Ji bo Xwedê qurtek av bide min." Ehmed, metereyê xwe ji rûbar tejî dike û didiyê. Av şor bûye lê dîsan jî, Derwêş vexwariye, her ku vedixwe tê ser hişê xwe û gotiye; "Navê min Elî ye, ez derwêşek im. Li Îranê her kes min dinase. Du meh berî niha ketim rê daku biçim Meşhed. Lê doh nexweş ketim, tayê ez girtim. Ev sê car in tê serê min, tu dizanî nexweşiyek kujer e. Di vê şeva tarî de heta ku vê newala siya mirinê li ser derbas bikim li ba min be. Dema ruhê min pir derbas kir jî, vî kîsikê ji çerm ê di stuyê min de bibe. Tê de qedehek krîstal heye, eger rast bêbikaranîn dê ji te re hêz û dewlemendiyekî mezin bîne."

"Her sibeh dema ku rabûyî, dilopek av bixe qedehê, piştre jî baş berê xwe bidiyê, eger metirsiyek li nêzikê te hebe tuyê bibînî û..." Dibêje û nefes lê qut dibe, hêz têde namîne û nikare gotina xwe temam bike. Serê wî dikeve ber û koçî dinyayeke din dike. Ehmed kîsik vedike ku bi rastî jî wek Derwêş got tê de qedeheke gelekî xweşik heye. Vedigere cem bavê xwe, çi hatiye serê wî û gotinên Derwêş jê re dibêje.

Ehmed êdî her sibe radibe wek Derwêş gotiye dike. Dilopêk av dixe qedeha krîstal, baş lê dinêre, lê tiştekî nabîne. Çend rojan dema weha dike û tiştekî jî nabîne aciz dibe û dev jê berdide.

Rojekê rastî ba ûu bahozeke qûmê tên. Ba hewqasî qumê ber-belav dike ezman û roj naxwiye. Dema hewayê distînin dev û pozê wan tejî qûm dibe. Kevirên biçûk yên ku ji ber ba dipekin li

dev û rûyên wan dikevin. Tişta xirab jî, cihekî ku xwe bidin ber û biparêzin nîne.

Di nav tirs û êşê de ji derekê diçin derekê. Piştî çend saetan bahoz radiweste. Lê vê carê jî hevdû nabînin. Li çolê wenda bûne, ne xwarin, ne jî av heye. Ehmed wek di xew de be; di nav wan kevir û latan de dikeve û radibe, stirî dikevin laşê wî, lê ew bêrawestan dimeşe. Lê demek tê, nikariye ku êdî gavekê jî biavêje. Bêhêvî dikeve û li benda mirinê dimîne.

Li cihê ku ketiye di xew ve diçe. Çiqasî razaye nizane; veciddiniqe û dema çavên xwe vedike dibîne ku li beramberî merivekî pîr rawestiya ye, dikene û dipirse; "Ehmedê biçûk, kurê Ebdullayê sabûnfiroş, te ez nasnekirim? Ez mamê te me. Ji bo ku te rêya xwe wenda kiriye qet negirî? Destê min bigre, em bi hev re li bavê te bigerin."

Ehmed heta wê rojê qet mamê xwe nedîtibû, bavê wî jî qet behsa wî nekirîbû. Ligel ku evna hemû dihatin bîra wî jî lê dîsan destê merivê pîr digire û bi hev re dimeşin. Bi saetan dimeşin lê qet agahiyek, şopek ji bavê wî naxwiye. Ehmed dawî rûdine û dest bi girî dike: "Gelekî westiyam, nikarim êdî gavekî jî bavêjim." Kalê pîr jî wiha bersiv dide; "Rakeve kurê min, dê çavê min li derdorê be."

Êdî çavên Ehmed ji xewan dikin ku werin girtin, kalê pîr pişta xwe dayê. Ehmed berê xwe didiyê ku ranên wî wek yên miyan ziravin. Tê bîra wî ku evê dibêje "ez mamê te me" ew e ku li Îranê wek 'sîhîrbazê çolê ' yan jî 'Merivê Pîrê Çolê' tê nasîn. Lê halê wî yê ku rabe ser piyan nemaye. Bi dengekî bilind dike hawar û ji hişê xwe diçe.

Hewareke din tevlî li hewara Ehmed dibe, bi çav miçênkekê jinikeke gelekî xweşik derdikeve holê. Di destê wê de qolyeke ku bi zêr û zîv hatiye çêkirin hebûye. Jinik vî kolyeyî dirêjî kalê pîr dike. Kalê pîr dema kolye dibîne wek berazekî kovî ber bi çiyan direve. Piştre tê zanîn ku vê kolyeyê hemû hêza wî biriye.

Ev jina xweşik ew 'prenses'e ku Ehmed Ìi Meşhedê ew ji destê şêr rizgar kiriye. Şahê bavê wê, ji bo seferekê di nêzikê wir ve derbas dibe û bêhnvedanek daye, wê hewara Ehmed bihîstiye û yekser hatiye cihê hewarê. Li wir Ehmed dibîne û jê re dibêje; "Tu jî bi me re were." Roja din bavê Ehmed jî dibînin, hemû ligel Şah diçin paytext...

Kalê Pîr ê Çiyan, ligel merivên xwe li deverek çiyayî ku sê rojan dûrî paytext e dijiya. Hewqasî bi hêz bûye ku, herkesekî guhdariya wî dikir. Tenê fermanekê bide yekî. Wî kesî yekser xwe ji çiyan diavêtiye xwar, an jî diçû dûrtirîn derên cîhanê.

Dema dibihîze ku Şahê Îranê jib o jinavbirina wî û darûdestên wî artêşêk amade kiriye gelekî aciz dibe; berê xwe dide zilamekî xwe û dibêje, "Here min ji vî Şahî rizgar bike!" Peyayê wî axaftina mire xwe neke didu, hinek nan, av û xencereke tûj hildigre û dikeve rê.

Ehmed, piştî ji van serpêhatiyên xwe yên li çolê û ji dest Pîrê Çolê rizgar dibe, qedeha kristal dîsa tê bîra wî. Her sibeh ku radibe, dilopek av dixe hundirê wê û lê dinêre, lê tiştekî nabîne. Sibehekê dîsan radibe, dilopêk av dixe qedehê û lêdinêre ku çi bibîne! Şah di xew deye û merivekî xencer bidest li cem rawestiya ye. Yekser diçe ji Şah re dibêje. Şah guhê xwe dide axaftina wî û dikene. Ji ber baweriya Şah bi zêrevanê wî hebû.

Lê, Ehmed dev jê bernedêye. Dest bi çavdêrî kirina Şah kiriye. Bûye şev, her der bêdeng e. Piştî kêliyekê, zêrevanên Şah jî xur-xur ketine xewê. Saet derbas bûne, Ehmed jî kiriye ku raze, lê temaşe dike siyeke reş bi dîwarê odeya Şah ve hildiperike.

Siya reş hindik maye ku bikeve odeya Şah, Ehmed xwe diavêje ser û dike hewar. Hemû kesên di qesrê de radibin ser piyan û êrîşkar yekser digirin.

Kalê Pîr ê Çiyan, dema dibîne peyayê wî nehat, peyayekî xwe yê din dişîne. Dema ew jî nayê, sêyem, piştre çarem û her car peyayek şandiye. Di dawî de peyayê xwe yê xedar û jêhatî dişîne. Lê Ehmed her kesekî di ava qedehê de dibîne, Şah agahdar dike û êrişê asteng dike.

Dawî Şah bangî Ehmed dike û jê re dibêje; "Bixwaze, tu çi ji min dixwazî!" Ehmed jî wiha bersiv dide; "Ev 'evdê te ne dewlemendiyê û ne jî meqeman dixwaze, min dema keça te dît, ez bûm aşiqê wê, daxwaza min ew e bi keça te re bizewicim."

Şah, dibêje; "Eger ew jî bixwaze çima nebe?" Dema prenses jî dibêje ku kêfa wê ji Ehmed re tê, Şah wan dizewicîne. Ev kêfxweşiya wan bi kêfxweşiyeke din zêdetir bûye. Bi dîtina formûleke nû ya çêkirina sabûnan û zêde firotina wan bavê Ehmed gelekî tê naskirin û dewlemend dibe. Bavê Ehmed jî di bin bandore qedeha kristal de dimîne û navê sabûnên xwe dike "Kristalê Çolê"

Jiyana hemûyan wek kristal xweşiktir dibe.

ꙮ

# ÊZİNGFİROŞ

Hebû nebû zemanê berê êzingfiroşekî hejar hebû. Her roj diçe êzingan dibire, dibe difiroşe û bi wan pereyan tiştên xwarinê ji malbata xwe re tîne. Rojekê serê sibehê berî ku here êzingan bibirre, hinek nokan diqelîne ku di rê de bixwe. Dikeve rê, ji aliyekî ve dimeşe, serê her çend gavan jî nokekê diavêjê ber bi jor û hewl dide bi devê xwe bigire, bi vî awayî ferq nake qaşo çiqasî meşiya ye.

Êzingfiroş dena tê nêzikî bîra li ber bistanê Ûsiv dîsa nokekê berjor diavêje, lê nok diçe dikeve bîrê. Êzingfiroşê feqîr nizane wê ji bo çi xemgîn bibe, bo wenda kirina nokê, bo feqîriya xwe yan jî bo dem derbas kirina li rê, diçe ser devê bîrê, xwe ditewîne û ber bi hundirê bîrê bang dike;

“Noka min, noka min!
Dermanê birçîbûna min!
Noka min, noka min!
Dermanê birçîbûna min!”

Bê vêca ka çawa bank kiriye, ji binê bîrê dengek tê: “Apo! Me rehet bihêle! Çiye tu wiha dikî hewar, tu guhê me kerr dikî? ”

Êzingfiroş gotiye; “Ez noka xwe dixwazim“ û dîsan kiriye hawar:

“Noka min, noka min!

Dermanê birçîbûna min!

Noka min, noka min!

Dermanê birçîbûna min!”

Ji binê bîrê bersiva wî didin: “Apo! Ma pêwist dike tu hewqasî bang bikî? Ha ji te re kodikeke darinî, tu çi bixwazî tuyê tê de bibînî; Tuyê rûnê ji xeynî nokan tiştên din jî bixwî. Lê tenê tu dikarî vê kodikê li malê bikarbînî. Pêwiste wextê ku roj baş bilind bû jî tu saetekê kodikê bixî nav avê.“ Êzingfiroş spas dike û kodika xwe werdigre. Heta êvarê bi xwe re digerîne, êvarê dema vedigere mal derî digire, kodika xwe datîne ber xwe û jê re dibêje; “Kodika darinî, ez savar, goşt û li ba wan jî mast dixwazim!”

Gelo hun dibên çi bûye? Heta çavmiçênkekê, savar, goşt û mast tên dikevin kodikê? Êzingfiroş hewqasî zêde dixwe ku nikare ji cihê xwe rabe. Piştî wê naçe êzingan, sibê heta êvarê li malê rûdine û rojê sê caran ku çi xwest wê dixwe û yên ku mayî jî diavêje.

Rojek ji rojan tebata wî naye, ji xwe dipirse; “Ma ez ê her di vê holikê de bijîm? Dixwazim herim derve, demên xweş derbas bikim. Lê ez çi ji vê kodikê bikim?” Piştre nema xwe digire û dibêje; “Ez ê li ba Faroqê cîranê xwe deynim“. Diçe li deriyê Faruk dide û jê re dibêje; “Faroq, bila ev kodik li ba te be, baş lê

miqate be, neşkê ha! Tu çi bixwazî dide, wek savar, goşt, mast, meqerne... Lê pêwiste tu rojê saetekê ku roj bilind bû bixî nav avê. Ez ê piştî çend rojan werim."

Êzingfiroş, hê nezîviriye ku here, Faroq şaşo maşo dibe, meraq dike dibêje; "Ez, savar, li ser goşt û li cem jî mast û dolma dixwazim." Hema ew hemû xwarin dikevin kodikê. Hemû malbat dirûne û baş zikê xwe têr dikin.

Faroq dibêje; "Zehmet e Êzingfiroş careke din vê kodikê bibîne? Dema ku hat em ê kodikeke wek vê bibînin û bidinê, bila nikaribe xwarinê jî bixwe, ew yek kes e, em gelek in."

Wek difikire jî dike. Piştî çend rojan Êzingfiroş tê û dema kodika xwe dixwaze Faroq kodikeke wek ya wî didiyê. Êzingfiroş kodikê dibe malê, gelekî birçî bûye. Datîne ber xwe û dibêje; "Bila savar û goşt, li çem jî mast were." Lê dibîne ku libek savar jî nakeve kodikê. Dibêje; Meqerna, şorbe, şîranî..." Lê dîsa tiştêk nakeve kodikê.

Yekser diçe li deriyê cîranê xwe dixe. Faroq, her du destên xwe dideyne vî alî û wî alî derî û dibêje; "Tu çi dixwazî? Kodika ku te daye min ev e. Ma tiştekî din ji destê min naye!"

Êzingfiroş dîsan ji neçarî diçe nokên xwe berhev dike û diçe êzingên xwe. Disa di rê de nokan davêje jor û bi devê xwe digre û bi rêya xwe de diçe. Ku tê cem bîrê dîsa nokek diçe dikeve bîrê. Ew dîsan diçe xwe bi ser bîrê de xwar dike û dibêje;

"Noka min, noka min!

Dermanê birçîbûna min!

Noka min, noka min!

Dermanê birçîbûna min!"

Deng ji bîrê tê; "Tu dîsan çima bang dikî? Ma me kodika darinî neda te?"

Êzingfiroş bersiv dide; "Kodik êdî bi kêrî tiştekî nayê. Ez çi dixwazim nakevê kodikê."

Ji binê bîrê deng tê û dibêjin; "Madem wiha ye vî aşê biçûk bibe, ku tu rast bizîvirînî zêr, çep bizîvirînî zîv derdikevin û dê te dewlemend bikî."

Êzingfiroş bi bazdan vedigere kolika xwe, derî digire, aşê xwe dideyne ber xwe û dest bi zîvrandinê dike. Carna zêr û carna zîv derdikevin. Berîka xwe tejî dike, piştre çi derê bixwaze diçiyê û tişta dixwaze dike. Mehekê wiha jiyana xwe derbas dike. Rojekê tirsek dikeve dilê wî; "Ger rojekê ez ne li malê bim henek werin, derî bişkînin û aşê min bidizin?"

Vê carê diçe ba cîranekî din bi navê Yasîn û jêre dibêje; "Bila ev aşê biçûk li ba te be heta ez têm, gelekî lê miqatê be." Yasîn jî dipirse; "Çima hewqasî girîng e gelo?" Êzingfiroş bersiv dide; "Giringe, ji ber dema tu rast bizîvrînî zêr, çep jî bizîvrînî zîv derdixe."

Êzingfiroş diçe naçe Yasîn, yekser destikê aş dizîvrîne; Li beramberî xwe çi bibîne? Gotina Êzingfiroş rast dernekeve? Bi rastê de zîvirandiye zêr, bi çepê de zîvirandiye zîv...

Êzingfiroş, piştî çend rojan vedigere. Berî here mala xwe rêya xwe bi mala Yasîn dixe û aşê xwe werdigire. Dema diçe malê rast dizîvirîne, çep dizîvirîne; lê belê ne zêr heye û ne jî zîv... Gelekî hewl dide lê aş êdî kar nake.

Çi bike? Dîsan diçe êzingên xwe. Di rê de dîsan nokên xwe diavêje ber bi jor û bi devê xwe digre. Lê ew çi ye? Dîsa nokek neçe nekeve bîrê?

Diçe ser bîrê û dest bi girî dike:

"Noka min, noka min!

Dermanê birçîbûna min!

Noka min, noka min!

Dermanê birçîbûna min!"

Deng ji kûrahiya bîrê tê; "Apo, tu me aciz dikî, ma me kodika darinî û aşê biçûk neda te? Hê tu çi dixwazî?"

Êzingfiroş bi xemgînî dibêje; "Ew hatin dizîn."

Dengê ji binê bîrê tê dibêje: "Wê demê ha ji te re darek! Tu dar dibî cem yên ku kodik û aş dizîne, jê re dibêjî 'kekê dar, kî diz e, li wan bide!' Heta diz tiştên ku dizîne nedin ranaweste, li wan dide û dide..."

Êzingfiroş destpêkê diçe mala Faroq û jê re dibêje; "Wê kodika ku te diziye bide min!" Lê ti nêta ku Faroq bide nîne û dibêje; "Min kodik da te!" Êzingfiroş: "Baş e, guneh li ser min nema..." Ji darê xwe re dibêje; "Daro daro, kî diz e, li wî bide!"

Dar, li serê Faroq dixe û dideyniyê.Hewqasî lêdide ku Faroq aciz dibe û ji neçarî dibêje; "Kodika te serê te bixwe, waye li ser wî refî ye, rajiyê û here! Lê ji vî darî jî re bibêje êdî bila li min nede."

Êzingfiroş, kodika xwe dixe bin çengê xwe û diçe malê. Carekê diceribîne ku wî kar dike. Çi xwarinê dixwaze dikeve kodikê. Yekser radibe û diçe mala Yasîn, li derî dixe, Yasîn derî vedike.

Dema Yasîn dibîne ji dar re dibêje; “Daro kî diz e lê bide!” Dar, radibe û bi Yasîn dikeve. Êdî Yasîn aciz dibe û dibêje; “Aşê te serê te bixwe, waye li wê derê ye, rajiyê û biçe, lê ji vîna re jî bibêje bila raweste rica dikim.”

Dîsan dar radiwestîne, aşê xwe hildigre û diçe malê. Wî jî diceribîne ku waye ew jî kar dike. Bi aliyekî de zêr, bi aliyê din de zîv derdikevin. Gelekî kêfa wî tê. Dest bi jiyaneke xweş û asûde dike. Careke din kodika xwe û aşê xwe nabe cem tu kesî. Ji bo ku hejarî û birçîbûn dizanî her dem ji hejar û birçiyan re dibe alîkar.

Ji ezmanan sê sêv tên, yek dikeve ser serê yê ku ev çîrok gotiye, yek dikeve ser serê yê ku guhdar kiriye, yek jî dikeve ser serê Ezingfiroş.

## ROVÎ Û NANÊ BİÇÛK (Sewik)

Di serdemekê de li ser serjêrêkî holikek hebûye û di wê holikê de jineke malkir dijiya. Jinik rojekê bo xwarina xwe sê nanan çêdike û davêje firinê. Yek mezin, yek navendî, yek jî biçûk bûye. Ku nan dibijirin, derdixe û dixe ser sifreyekê daku sar bibin. Nanê mezin û yê navendî li ser sifrê bi rehetî ji xwe re dimînin; lê nanê biçûk ku baş pijiriye û ji xwarinê re amade ye, box we difikire û dibêje:

"Bo çi ez li vir bisekinim û li benda mirovan bûm ku min bixwin? Ez ê li derveyê vê male li bextê bigerim." Bi vî awayî xwe diavêje xwar û ber bi deriyê holikê xindirî. Ji bo ku zemîneke serjêr e, li wir nasekine diçe xwarê. Ji xwe re dibêje; "hinekî zû bû lê dîsan jî ji derneketinê baştir e." Carekê dibîne ku rubarek li ber wî serjêrî diherike. Li ser jî pirek yan jî tiştekî ku pê derbasbe nîne. Di heman wextî de dibîne ku roviyekî mor û sor, didantûj û çav biriqî li wir e.

Rovî hinekî nêzîkê nan dibe û jê re dibêje, " Rojbaş nanê biçûk, gelo tu dixwazî derbasî wî alî avê bibî?"

Nanê biçûk bi rûyêkî tirş bersivê dide; "Rojbaş roviyê birêz" li aliyê din jî ji didanê tûj û çavên biriqî dikeve şikê. Dîsa jî dibêje, "belê, bi rastî jî xwestekeke min a wiha heye."

Rovî: "Eger tu bixwazî, ez dikarim te derbasî wî alî bikim."

Nanê biçûk: "Na, ger ez wê pêşniyara te qabûl bikim, tê min bixwî."

Rovî: "Te bixwim? Ez gelekî bi wê fikra te êşiyam, çawa dikarim te bixwim. Ka were ser tiriya min rûne, ez ê te bi sobayan derbasî wî alî bikim."

Nanê biçûk ji bo ku asayî derbasî wî alî bibe û dilniya be, xwe dide ser serê tiriya rovî û bi hev re dikevin nav ava rubar.

Ku çariyeke avê derbas dikin, Rovî dibêje "her diçe av kûr dibe ji bo ku tu nekevî avê were ser pişta min." Nanê biçûk tê li ser piştê rûdine. Ku tên nîvê avê, Rovî vê carê pişta xwe hindikî dixe avê û dibêje, "were ser serê min rûne, av kûrtir dibe." Nanê biçûk vê carê dixape û tê ser serê Rovî rûdine. Ku çarîkeke avê dimîne rovî dibêje "evder cihê kûrtirîn avê ye, bo ku metirsîdar nebe, were ser pozê min rûne." Nanê biçûk dîsa bawer dike û diçe ser pozê Rovî rûdine.

Êdî tiştekî zêde nemabû. Rovî hê ku ji avê derneket, carekê serê xwe radike nan diavêje jor, hê ku nehatiyê xwarê jî bi devê xwe digre û noşî can dike. Ku hat vî alî avê, nanê biçûk nemabû lê tama wê di devê Rovî de bû. Bo wê jî zimanê xwe li keviran dixe û paqij dike.

ꕤ

## MASİYÊ BİSÊHR Ê ZÊRÎN

Di serdemekê de heft caran ji heft welatan wê de, teqrîben di mesafa dengê qirikê de dareke maziyê ya herî mezin û dirêj hebû. Dirêjiya darê bi qasî heft caran li gola ku heft caran heftêûheft girav li ser hebûn bû, heft caran heftêûheft çiqlên wê hebûn. Li ser her çiqlekî heft caran heftêûheft hêlîn hebûn. Di van helînan de heft caran heftêûheft çêlikên qirikan hebûn. Çîroka me jî ha li vir derbas dibe.

Zemanekî li ber goleke şîn wek ezmanan, holikek ji daran hebû. Di holikê de masîgirêk ligel hevsera xwe dijiya. Masîgir ji van golên derdora xwe heft caran heftêûheft salan bi girtina masayan mijûl dibû. Jina wî jî pembu diçand, qumaş çêdikir. Ligel wan mehên-mêşinên xwe jî bi xwedî dikirin, hiriya wan jî dikir qumaş. Jiyana herdukan jî bi rehetî berdewam dikir, baş dixwin, xwe baş dinixumînin, cilên germ li xwe dikin. Jiyana wan tenê ji van tiştan pêkdihat.

Masîgir, sibehekê disa radibe diçe masiyan. Wê rojê şenşê wî nebû, nikarî yek masiyekî jî bigire. Êdî dema dixwaze here malê, dibê ka ez careke din tora xwe biavêjim, belkî bextê min guherîbe. Tora xwe belaw dike û careke din diavêje golê û gelek derbasnebû dikişîne. Dema tora xwe dikişîne, dibîne ku çi bibîne. Masiyêkî zêrîn ketiyê, ev masî gelekî cuda ye ji yên din. Baskên wî, laşê wî û dûvikê wî hemû zêr in.

Mêrik, xwe ji xwe re dibêje, "em dê çi bikin, ji nebûnê baştir e, qet nebe masiyêkî taybet e, jina min wê pê dilxweş bibe." Masiyê xwe dixe sebeta xwe.

Masî ku ket sebetê, dest bi axaftinê dike û dibêje, "Masîgirê pîr, min disa bavêje avê, tu ji min çi dixwazî bixwaze, ez dikarim her dewlemendiyê bînim ber lingên te."

Masîgirê pîr gelek bêhn fireh, bêdeng û narîn e, hinekî difikire, destê xwe davêje riyên xwe û bi hêdî destê xwe davêje masî bo ku neêşîne, derdixe û dîsan diavêje nav ava golê. Dibêje, "Masiyê biçûk tu dikarî vegerî şûna ku tu jê yî."

Mêrik dema diçe malê, jina wî tê li sebetê dinêre ku qet tiştêk nîne. Dibêje, "ev çi ye? Çawan tiştekî wa dibe? Ez êvarê çi şîvê çêbikim?

Mêrik dibêje, "xanim îro tenê min karî yek masî bigrim, ew jî masiyêkî taybet bû, hem jî hemû zêr bû. Ji min re axifîr, got eger tu min dîsa berdî nav avê, tu ji min çi dewlemendiyê bixwazî, ez wê tînim ber lingên te. Dilê min jî pê şewitî û berda golê.

Jinik, "Tu çi dibêjî? Masiyêkî taybet digirî û disa jî berdidî û ew jî diçe, waye? Madem ku ji te re qisekir te çima xaniyêkî ku dilop neke jê nexwast?

Acizî û qewrandina jinikê, mêrik aciz dike. Mêrik radibe diçe ber gole. Li golê dinêre û bangî dike: "Masiyê zêrîn, masiyê zêrîn tu li ku yî?

Masî avjeniyê dike û tê nêzikî dibe, serê xwe radike û dibêje, "Çi ye? Te xêr e?

Masîgir, "Jina min xaniyêkî ku dilop nake dixwaze, tu dikarî ji me re alîkarî bikî?"

Masî, "Başe, tu wek ku xanî çêkirî be bizane, bizivire here mala xwe." Got û disa ket bin avê.

Mêrik dema dizîvire malê, dibîne ku holika wî rab/ûye, li şûnê holikek mezintir û serdora wê nixumandî heye.

Jinik ku vê dibîne, hê zêdetir xwe ji mêrik re diqehirîne û dibêje:" Madem tiştekî wiha heye te çima xaniyêkî nû û du odeyî nexwest?"

Mêrikê feqîr dibîne ku xwesteka jinikê bicîh neyîne, jinik tu rehetiyê nadiyê. Disa diçe ber golê û bangî masî dike: "Masiyê zêrinî, masiyê zêrinî, alikariya te ji min re divêt"

Wek cara pêşin, masî disa tê cem û dibêje, "Çima te bangî min kir? Tu çi dixwazî?

Masîgir: "Bibore masiyê bê hempa, spas bo nûkirin û nixumandina holika me. Lê, hevjîna min niha jî xaniyêkî du odeyî, baş û nû dixwaze."

Masî, dîsa dibêje: "Tu wî jî wek çêkirî bizanibe. Niha rabe bizîvire here mala xwe." Û disa dikeve bin avê û wenda dibe.

Mêrik dema tê malê, dibîne ku xaniyekî wek jinekê dixwest li şûna holikê ye. Bi boyax, ber û perdeyên nû hene û bace û pencerên wê jî hene. Midbex mezin û li midbexê jî argeh û ciyekî rûniştinê yê baş jî heye. Wek jinikê dixwest odeya razênê jî cuda ye.

Hevjîna wî ya çav birçî tê, li xanî dinêre û dibêje: "Hey mêrikê kêm aqil, qet nehat bîra te tu vîlayeke mezin ku xulam û xizmetkarên wê hene û fayton li ber derî bixwazî? Ez her wext wek gundiyan dikarim bijîm? Ma mafê min ê ku bi cilubergên xweşik bigerim nîne?" Piştî axaftinê jinikê sêniyek jî avêt mêrê xwe, başe ku sênîk lê neket, li dîwar ket û şikest.

Herweha mêrikê faqîr paş de zîvirî û dîsa çû ber gola xwe, dilê jinikê dîsan xweş nebûbû. Dîsa bangî masî kir, "Masiyê zêrîn, Masiyê zêrîn, bi rastî dîsa alikariya te ji min re divê." Masî, çend fetil li xwe xistin û dîsa hat cem mêrik. "Çi bû? Bo çi bangî min dikî? Masîgirê pîr.

Masîgirê pîr, bi şerm jê re got: "Bibore, min bibexşîne, jina min gelekî aciz e û hizur di nav me de nema. Heta sênîkek jî avêt min lê li min neket. Ji min aciz nebe bi rasti alîkariya te pêwiste. Niha jî hevjîna min vîllayêk, cilubergên baş, faytonek û hespên wê her tim amede li ber derî dixwaze. Ez dikarim çi bikim? Tu dikarî çi ji min re bibêjî?"

Masî, "Madem ku daxwaza te ew e, tu wê wek bûye qabûl bike, ew tamam e" dibêje û disa dikeve bin ava kûr.

Mêrikê feqîr, dîsa dizîivire tê mala xwe. Temaşe dike ku çi bibîne, wek holika wî ya berê xaniyê din jî nîne û li şûnê koşkeke çand qatî heye. Dikeve koşkê dibîne ku hevjîna wî bi cilubergên xweşik li ser maseyeke luks rûniştiye.

Ji jina xwe re dibêje “Werhasil êdî kêfa te hat cîh. Mirovên wek me êdî dikarin çi bixwazin?” Wiha bawer dikir ku mirovên wek wan masîgir, êdî tiştekî bixwazin nebû. Jiber her tişt hebû. Camên pencerayan wiha bûn ku nedihiştin ba were û tav berdidan hundir. Masiyê zêrinî soza xwe anîbû cih, tiştên ku ew û hevjîna xwe di xewnên xwe de jî nebînin, careke de dabûn wan.

Çend hefteyan rewş baş bû. Jina wî di van hefteyan de her cilubergên xwe li xwe dike, diçe li her derê digere, her tiştekî dixwe. Lê rojekê hat malê gelekî aciz bûbû. Bi dengekî bilind û nexweş bi ser mere xwe hilbû û got: “Tiştên ku Masî zêrinî bide me, ma hevqas e? Ez diçim gerê, hinekan dibînim bi dehan mihafizên wan hene. Çî min ji wan kêmtir e? Ez gelek mihafizan dixwazim, hunermen, stranbêjan dixwazim ku li dora min stranan bibêjin. Bila micewher û hespên min ên baş hebin. Bila keştiyên min ên mezin hebin daku ez bikaribim pê biçim di her golekê de bigerim.” Jinik wiha bang dikê û diqîre ku, koşkê tînê xwarê.

Masîgirê feqîr serê xwe ditewîne û dîsan berê xwe dide ber gola xwe. Bi rê de difikire, ji xwe re dibêje, “Ev çi ye? Gelo çareseriyeke ji vêna re nîne? Qet têrbûneke vê jinê nîne? Ev dê hê çi bîne serê me?” Ku gihîşt ber golê bangî masî kir. “Masiyê zêrinî, masiyê

zêrinî, tu li ku yî? Tu bi xwedêkî xwe ji min aciz neke? Biborîne. Jina min gelek tiştên din dixwaze, lewra ez şandim vir."

Masî yekser derket û got: "Masîgirê pîr, vê carê çi heye? Jina te hê çi dixwaze?"

Mêrikê feqîr tiştên ku jina wî dixwaze yek bi yek ji masiyê zêrinî re dibêje.

Masî, " Tu wek bi cî hatibe bizane." Dibêje û di na avê de wenda dibe.

Mêrik dike biçe malê dibîne ku keştiyeke mezin ji golê derket, têde bi sedan mirov dixwin, vedixwin. Ne tenê ewna jî. Diçe malê bi sedan mihafiz, di koşkê de bi dehan stranbêj û sazbend stranan dibêjin, jina wî jî di nav de ye. Ji bo xwe bi zahmetî rêyekê di nav mihafizan re dibîne û derbas dibe. Dibîne ku di guhên jina wî de guharên elmas, di destên wê de bazinên curbecur micewherat, li ser cilubergên wê dîsan her cureyêm micewheratan. Bi rastî masî vê carê jî dîsan zideyî wan tişt dabûn wan.

Lê na, xwestekên jina wî dîsan neqediya bûn. Vê carê jinikê rahişt sêniyeke zêrinî û avêt mêrikê feqîr, û got: "Ez dixwazim di nav golê de koşkeke min hebe, bi dirêjiya ezmanan. Ez bikarim hikim li masiyê zêrinî jî bikim. Ez dixwazim bikaribim hikim li hemû jiyana mirov û heywanan bikim, tirsê bixim dilê wan. Zûtir tu here van xwestekên min ji masî re bibêje." Feqîrê mêrik ji tirsan dengê xwe nake û diçe ber gola xwe.

Masîgirê pîr li golê dinêre ku rewş û tebgera avê agahiya bahozeke giran nîşan didin. Av radibe, dikele, pêl dide û her diçe

pelên wê bilind dibin. Dîsa jî bang dike:” Masiyê zêrinî, masiyê zêrinî, hawara min bibihîze û were alikariya min.”

Masiyê zêrinî, di nav pelên avê re serê xwe radike û xwiyayê ku gelek bihêrs bûye. Lê dîsa jî dibêje, “Ev jin şerm nake? Vê carê çi dixwaze? Derdê wê çi ye?

Feqîrê mêrik di rewşeke perîşan de ye, her dereke wî şil bûye, û serê xwe dixe ber xwe û dibêje: “Masiyê zêrînî min efu bike.” Û her xwesteka jina xwe jê re dibêje.

Masî hê ku gotina mêrik neqediya ye, serê xwe dixe bin avê û diçe wenda dibe. Faqîrê mêrik dîsa dizîvire tê mala xwe, ku çi bibine ne koşk e, ne mihafiz in, ne xanî ye. Tenê ew holika wan a berê ku dilop dikirin heye û jina wî ya pîr jî li ber derî li benda wî ye.

ဢ ဢ

# ŞÎVA ROJ, HEYV Û BA

Ji milyonan stêrkên li ezmanan, sê zarokên stêrkekê hebûn. Ji zarokan Heyv û Roj keçik, Ba jî lawik bûye. Di navbera her yek ji zarokan de salek hebûye. Dayîka stêrk hewl dide zarokên xwe bi hurmet, şefqat û rêzdarî mezin û perwerde bike. Her sê jî zarokên baş bûne. Lê dema mezin bûne, Roj û Ba havalên nebaş hilbijartine. Wan carna di bin bandora hevalên nebaş de, tevgerên nebaş kirine. Vê rewşê dayîka stêrk xemgîn kiriye. Lê dîsan ji bo ku ji perwerdeya xwe bawer bûye, digot berê xwe nadin tiştên nebaş.

Rojekê ji rojan Roj, Heyv û Ba ligel ap û metikên xwe bi navên Bahoz û Brûsk diçin xwarinekê bixwin. Ji ber gelek karê wê hebû ku li Rêya Kadizan bike, dayîka wan li malê dimîne û naçe xwarinê; xwestiye li malê li benda zarokên xwe be.

Roj û Ba xwarine û vexwarine, lê qet nehatiye bîra wan ku hinek xwarin ji dayîka xwe re bibin. Gelek qirçîl bûne. Haya wan ji xweperestî û bêfikriya wan nebûye. Lê Heyv ne wek wan bûye.

Ew li dayîka xwe jî fikiriye; Ji her xwarineke ku xwariye hinek cuda kiriye û bi awayekî rêk û pêk xiste ber neynûkên xwe yên dirêj û zirav.

Dema tên malê, dayîka wan ku ji dûr ve bi çavên xwe yên birîqedar temaşeyî wan dikir dibêje; "We çi ji min re anî?" Rojê herî mezin dibêje; "Min tiştêk neaniye, ez ligel dostên xwe çûm şahiyê, neçûm xwarinê ji dayîka xwe re bînim." Ba, dibêje; "Min jî tiştêk ji te re neaniye dayê, ez ji bo şahiyê çûm, çawa li benda tiştekî wiha dibî ku ji şahiyê vegerim ji tere bînim? Te du kevirên ji jor tên bixwarina, yan jî bi me re bihata û tiştekî wiha negotiba." Dayîka Stêrk, bi van gotinan gelek diêşe, çavên wê tije girî dibin, bi çar destên xwe birîqedar çavên xwe paqij dike û di dilê xwe de jî dibêje; "Nankor no." Û dîsan dibêje; "Lê bi seatane ez odeyên we paqij dikim. "Gotina Heyvê ji ya wan ferqtir bûye; "Ka sênîkekê bîne daku tişta min hilgirtiye têximê." Dema sênîk tê, destên xwe dihejîne û tiştên di ber neynûkên Heyvê de dikevin sênîkê, bi vêna re xwarineke gelekê baş derdikeve holê.

Wî wextî dayîka Stêrk berê xwe dide Rojê û dibêje; "Ji ber ku tu çûyî şahiyê û xwarinê, tu qet li dayîka xwe nefikiriye, divê ti bê cezakirin. Piştî vê, tîrêjên te wê gelekî tîn û germ bin, ku kesek nikaribe destê xwe bide te, dema tu derketî holê dê dev û rûyên xwe bigirin, nikaribin berê xwe bidin te."

Belê, ji bo wê Roj weha germ e.

Piştre li Ba dizîvire û jê re dibêje; "Ji ber tu gelekî xweperestî dayîka te nehat bîra te. Ceza yê te jî, rojên germ jî tu yê werî, her

tiştî berba û tevlîhev bikî, bidî hev û bişkênî. Mirov wê ji te birevin. Tê bibî wek serxoşekî ku hemû tiştî belawela dikî."

Belê, ji bo wê yekê ye Bayê zêde bêzarker e.

Dor tê Heyvê, Dayîka Stêrk jê re dibêje; "Keça min, ji bo ku ez hatim bîra te, te ji her xwarinekê hinek ji min re anî, tu yê aram û geş bî. Qet tiştêk tevlî şewqa te nabe, mirov dê ji te hez bikin, dê helbest û stranan ji bo te binivîsin û bibêjin."

Belê, ji bo wê şewqa heyvê nerm, hênik û hewqasî xweşik e.

# SÊVÊN XORTANIYÊ

Li welatekî ku cihê wî nayê nezanîn, qraliyetek hebûye. Kesî nazaniya ev qraliyet kengî hatiye damezrandin. Qralekî wan hebû. Sê kurên wî hebûn. Navê ê mezin Fedor, navê ê navîn Vasîlî, navê ê biçûk jî Îvan bûye.

Sal zeman derbas dibe, qral pîr bûye, çavên wî êdî wek berê nema dibînin. Bê ka ji ku dibihîze, dibihîze di nav axa qraliyetê de, baxekî sêvan heye dema ew sêv tên xwarin mirovan ciwan dikin û di nav baxê sêvan de jî bîrek heye dema mirov dest û rûyê xwe pê dişo bînahiya çavan ji berê bihêztir dike.

Qral, rojekê mîr û serok eşîran dicivîne û ji wan re dibêje; “Di nav we de her kî xwebexş hebe, bikare ji wan sêvên mirovan ciwan dikin û wê ava bînahiya çavan bihêztir dike ji min re bîne, ez ê nîvê qraliyetê didim wî.”

Şahzade Fedor dema vêna dibihîze yekser tê pêş û dibêje; “Em naxwazin axa welat ji yekê din re here, ez dê bi xwe herim wan sêvên xortaniyê û avê bînim.”

Piştre diçe axur, hespê xwe amade dike û qamçiyeke nû dixe destê xwe, siwar dibe û dikeve rê.

Kêm diçe zêde diçe, gir û deştan derbas dike, bi şev û roj diçe digihe sêrêyanekê. Li ser sêrêyanê tabelayêk heye û wiha nivîsiye: "Her kî di rêya rastê re here, xwe rizgar dike lê hespê wî wenda dibe. Her kî bi rêya çepê de here, hespa wî rizgar dibe lê ew bi xwe wenda dibe. Her kî jî raste rast here jina ku pêre bizevice dibîne."

Şahzade Fedor, "Ez ê bi rêya ku jina pêre bizewicim bibînim de herim." Dibêje û raste rast hespê xwe diajo. Piştî ku gelek rê meşiya, xaniyekî ku banê wê ji zêr tê pêşiye. Keçikeke gelekî xweşik ji koşk derdikeve û pêşwaziya wî dike. Dibêje, "Tu bi xêr hatî, ez bibim alîkar, dakeve xwarê, ez dixwazim mêvandariya xwe pêşan bidim."

Fedor; " Ez ne xwarinê dixwazim, ne jî radizêm. Ji ber rêya min gelekî dirêj e. Pêwiste demekê zûtir herim."

Keçik; "Wiha nekin, ji bo ajotina hesp hewqasî ecele mekin, werin, zewkên jiyanê tam bikin" dibêje û jê re dibe alîkar û bi hevre diçin koşkê. Keçik, xwarineke baş dideyne ber prens-şahzade, vexwarinên sar tîne û piştre wî dibe cihê ku lê raze.

Şahzade, ji ber xwarin û vexwarina meyê çavên wî tên girtin û dema li ser cih xwe dirêj dike nake, keçik cih berevajî diqulibîne; prens dikeve valahiya jêr cih û ji wir jî dikeve zîndanekê.

Di navberê de zemanek derbas dibe, Şah temaşe dike ku Fedor nehat. Dîsan civîneke mezin lidar dixe û dibêje; "Eger kesek ji we xwebexş hebe û bikaribe, ji nav baxên qraliyetê wan sêvan

ku mirovan dike xort û ji wê ava çala ku bînahiya çavan bihêz dike ji min re bîne ez ê nîvê axa qraliyeta xwe bidim wî."

Şahzade Vasîlî dema vê yekê dibihîze, tê pêş û dibêje; "Em naxwazin ku qraliyet ji kesekî din re here, ez ê herim wê avê û wan sêvan bînim."

Paştre diçe axur, hespê xwe amade dike û qamçiyeke nû dixe dest xwe, siwar dibe û dikeve rê.

Kêm diçe zêde diçe, gir û deştan derbas dike, bi şev û roj diçe digihe sêrêyanekê. Li ser sêrêyanê tabelayêk heye û wiha nivîsiye: "Her kî di rêya rastê re here, xwe rizgar dike lê hespê wî wenda dibe. Her kî bi rêya çepê de here, hespa wî rizgar dibe lê ew bi xwe wenda dibe. Her kî jî raste rast here jina ku pêre bizevice dibîne."

Şahzade Vasîlî, "Ez ê bi rêya ku jina pêre bizewicim bibînim de herim." Dibêje û raste rast hespê xwe diajo. Piştî ku gelek rê meşiya, xaniyekî ku banê wê ji zêr tê pêşiye. Keçikeke gelekî xweşik ji koşk derdikeve û pêşwaziya wî dike. Dibêje, "Tu bi xêr hatî, ez bibim alîkar, dakeve xwarê, ez dixwazim mêvandariya xwe pêşan bidim..."

Vasîlî; " Ez ne xwarinê dixwazim, ne jî radizêm. Ji ber rêya min gelekî dirêj e. Pêwiste demekê zûtir herim."

Keçik; "Wiha nekin, ji bo ajotina hesp hewqasî ecele mekin, werin, zewkên jiyanê tam bikin" dibêje, jê re dibe alîkar û bi hevre diçin koşkê. Keçik, xwarineke baş dideyne ber şahzade, vexwarinên cemidî tîne û piştre wî dibe cihê ku lê raze.

Şahzade, ji ber westiyayîbû, xwarin û vexwarina meyê çavên wî tên girtin û dema li ser cih xwe dirêj dike nake, keçik cih be-

revajî diqulibîne; prens dikeve valahiya jêr cih û ji wir jî dikeve zîndanekê.

Dema dikeve dengek dipirse: “Ew kî ye ket xwarê?”

Şahzade Vasîlî dibêje; “Baş e, yê ketiye kî ye?”

Şahzade Fedor, “ Baş e, birayê min me her duyan li heman cihî hevudû dît.”

Di navberê de zemanek derbas dibe, Şah temaşe dike ku Vasîlî jî nehat. Dîsan civîneke mezin lidar dixe û dibêje; “Eger kesek ji we xwebexş hebe û bikaribe, ji nav baxên qraliyetê wan sêvan ku mirovan dike xort û ji wê ava çala ku bînahiya çavan bihêz dike ji min re bîne ez ê nîvê axa qraliyeta xwe bidim wî.”

Şahzade Îvan, tê pêş û ji bavê xwe re dibêje; “Yabo tu desturê bide min, ez ê herim sêvên xortaniyê jî û avê jî bînim; Herwiha ez dê berê xwe bidimê ka çi hatiye serê birayên min.“

Paştre tê axur lê, hespekî li gor xwe nabîne. Dema wiha difikire ka çi bike, jinikeke pîr derdikeve pêşberî û jê re dibêje; “Roj baş Şahzade Îvan, çima tu weha xemgîn xemgîn difikirî?”

Îvan dibêje; “Ma çawa nefikirim, min nikarî hespekî li gor xwe bibînim.“

“Bes, tu ji min re bibêje! Li xwarê di zîndanê de, hespekî bi zincîrê girêdayî heye. Tam li gor te ye. Eger te karî bibî, bila ji te re be.”

Îvan, diçe jêrê hesp ji zincîrê vedike. Hesp gelek kêfxweş dibe û her du lingên xwe yên pêş radike dideyne ser milê Îvan. Îvan hesp dibe axur, amade dike, lê siwar dibe û dikeve rê.

Zemanek derbas dibe tê ser wê sêrêyanê; Tabelayê dibîne û dixwîne... Her ji xwe re dibêje: “Ez bikevim rêya rastê, hespê xwe

wenda dikim; ma bê hesp ez dê bikaribim çi bikim? Rast herim, ez dê bizewicim; ma daxwaza min ne evna ye. Bikevim rêya çepê ez dê bikaribim hespê xwe rizgar bikim; ya herî baş mirov bikeve wê rêyê.“

Bi vî awayî dikeve wê rêya ku dê hespê xwe rizgar bike û serê wî bikeve belayê. Kêm zêde diçe, gir û deştan derbas dike. Di dawî de li holikekê rast tê. Di holikê de jinikeke pîr dijî. Lingên wê yên dirêj, milên wê ku ji enîşeke holikê heta enîşka din girtine û bêvileke wê jî ku digehişt aqda holikê hebûye.

Jina pîr; “Ox...Oxx... Ji zû de ye, ku min qet kes nedîtiye. Tu ji ku derketî? Çi karê te li vir heye? Tu li yekê digerî, yan ji hinekan direvî?”

Îvan dibêje; “Ev çi ye? Bê slav û klam tu pirsan ji min dikî. Ma tu xwarinekê, vexwarinekê, ciyekî razanê nadî min? Destpêkê zikê xwe têr bikim, piştre ez ê bibêjim ka ji ku têm û diçim kuderê.”

Jina pîr biya Îvan dike; hinek xwarin û vexwarin tîne, cihê lê raze pêşanî dide. Piştre li cem rûdine û dipirse: “Ka bibêje! tu kî yî? Ji ku tê? Diçe ku? Bavê te, dayîka te kî ne?”

Îvan dibêje; “Dapîr, Ez şahzade Îvan, ji vê qraliyetê têm, kurê şah im. Li sêvên xortaniyê û avê ku çavan wek berê dike digerim. Loma ketime van rêyan.“

Jina pîr; “Kurê min ê xoşewîst, hê gelek rêya te heye, sêvên xortaniyê jî û ava çavan baş dike jî, li baxçê jineke bihêz in. Jin jî xarziya min e. Lê tu dikarî bi dest bixe yan nexe, wêna nizanim.“

Îvan; “Dapîr, alikariya min bike, ji min re bibêje ka divê ez çi bikim?”

Jina pîr. “Gelek merivên xort di vir ve derbas bûn, kêm ji wan wek te axifîn. Tu hespê min bibe; gelekî bilez e. Wê te bibe ba xwîşka min. Ew jî dê rê pêşanî te bide.“

Îvan, wê şevê li wir derbas dike, sibehê radibe ji bo xizmet û mêvandariyê sipasiya jina pîr dike, li hespê ku wê dabûyê siwar dibe û dikeve rê. Dema qederekî diçe ji nişka ve hespê xwe disekinîne û dibêje; “Min lepikên xwe xistine” Hesp bersiv dide; “Xwiya ye tu ne di wê ferqê de ye dema tu diaxifî min çiqas rê hilanî.“

Şahzade, şev û bi roj li ser rêya xwe berdewam e. Paşê tê cem holikeke yek pencereyî. Dema ji cihekê hîre hîra hespekî tê hespê Şahzade Îvan jî dike hîre hîr. Ji dengê hespan jinek ji holikê derdikeve derve. Ev jin ji wêya ku berê pêrgî bûbû gelekî pîrtir e.

Jinik dibêje; “Xwedê zanê xwîşka min hat,” lê dema Îvan dibîne, dipirse; “Ji zû de ye min qet kesek nedîtiye ku di van deran re derbas bûbe, tu li kesekî digerî, yan ji yekekî direvî?

Îvan dibêje; “Ev çi ye? Bê slav û klam tu pirsan ji min dikî. Ma tu xwarinekê, vexwarinekê, ciyekî razanê nadî min? Destpêkê zikê xwe têr bikim, piştre ez ê bibêjim ka ji ku têm û diçim kuderê.”

Jina pîr biya Îvan dike; hinek xwarin û vexwarin tîne, cihê lê raze pêşanî dide. Piştre li cem rûdine û dipirse: “Ka bibêje! tu kî yî? Ji ku tê? Diçe ku? Bavê te, dayîka te kî ne?”

Îvan dibêje; “Dapîr, Ez şahzade Îvan, ji vê qraliyetê têm, kurê şah im. Li sêvên xortaniyê û avê ku çavan wek berê dike digerim. Loma ketime van rêyan.“

Jina pîr; “Baxçe yê jinêk bi navê Sineglazka ye. Kurê min, rê gelek metirsîdare, nizanim tu serdikevî yan na.”

Îvan; “Dapîr, alikariya min bike, ji min re bibêje ka divê ez çi bikim?”

Jina pîr. “Gelek merivên xort di vir ve derbas bûn, kêm ji wan wek te axifîn. Tu hespê min bibe; gelekî bilez e. Wê te bibe ba xwîşka min. Ew jî dê rê pêşanî te bide.“

Îvan, wê şevê li wir derbas dike, sibehê radibe ji bo xizmet û mêvandariyê sipasiya jina pîr dike, li hespê ku wê dabûyê siwar dibe û dikeve rê.

Dema qederekî diçe ji nişka ve hespê xwe disekinîne û dibêje; “Min lepikên xwe xistine” Hesp bersiv dide; “Xwiya ye tu ne di wê ferqê de ye dema tu diaxifî min çiqas rê hilanî.”

Şahzade, şev û bi roj li ser rêya xwe berdewam e. Paşê tê cem holikeke yek pencereyî. Dema ji cihekê hîre hîra hespekî tê hespê Şahzade Îvan jî dike hîre hîr. Ji dengê hespan jinek ji holikê derdikeve derve. Ev jin ji wan herdukên din gelekî pîrtir bûye. Berê xwe daye hesp, fam kiriye ku hespê xwîşka wê ye; lê ciwanê ku li hesp siware biyanî bûye.

Şahzade slav daye, gotiye ez dixwazim bibim mêvanê te. Jinikê hesp biriye axurê, xwarin û vexwarin ji mêvan re aniye, piştre jî dest bi pirsan kiriye: “Ka bibêje! tu kî yî? Ji ku tê? Diçe ku? Bavê te, dayîka te kî ne?”

Îvan dibêje; “Dapîr, Ez şahzade Îvan, ji vê qraliyetê têm, kurê şah im. Min xwîşka te ya biçûk dît, ez şandim ba xwîşka te ya navê. Wê jî ez şandim ba te. Baxekî jinekê bi navê Sineglazka heye

ku sêvên wê mirovan ciwan dikin û ava bîra wê bînahiya çavan bihêz dike, ez jî ji bo bibînim ketime van rêyan.“

Jinika pîr dibêje: “Kurê min ê xoşewîst, tu yê serkeftinê bidest bînî, nizanim. Rê gelekî metirsîdar e.“

Îvan: “Dapîr, alîkariya min bike, ji min re bibêje ka divê ez çi bikim.“

Jina pîr: “Gelek xort di vir re derbas bûn; kêm ji wan wek te axifîn. Ez ê ji te re bibim alîkar. Sineglazka xwarziya min e. Şervaneka bihêz e. Qraliyeta wê bi sûrên bilind û qalin dorpêşkirî ye. Li ber derî çavdêr hene, te naxin hundir. Divê tu bi wî hespê ku ez dê bidim te, bi şev herî. Dema tu nêzîkê sûran bûyî, qamçiyekê bi hêdî li hesp didî; Bi yek çîvê ew dê sûran derbas bike. Hesp bi cihekî ve girêde, bikeve nav baxçe. Sê sêvan jêke, zêdetir na. Metere jî tejî av bike. Wê demê Sineglazka li odeya xwe razayî ye; eman tu nekevî odeya wê. Li hesp swar be, dîsan bi hêdî qamçiyekê lêde, dê xwe di ser dîwêr re biavêje.”

Îvan piştî van gotinên jinikê, bi şev li wir namîne. Hespê ku jinikê dayiyê tîne der, lê swar dibe û dikeve rê. Hesp wek difire diçe, xwe di ser gol û rubaran re diavêje. Piştî demekê dighin ber sûran. Wext nîvê şevê ye. Li ber derî sî û sê şervan hene. Îvan, wek jinikê jê re gotiye, bi hêdî qamçiyekê li hesp dide; hesp wî dîwarê bilind derbas dike.

Îvan, yekser xwe ji ser pişta hesp diavêjê xwar û dikeve nav baxçe; dibîne ku pelên darên sêvan ji zîv in, sêvên bi darê ve jî, wek zêr in. sê sêvan jêdike, metereyekî jî ji ava bîrê tejî dike. Lê nikare xwe kontrol bike û ji bo Sineglazka şervana bihêz bibine diçe koşka wê.

Hemû kes di xew de ye; li aliyekî şeş, aliyê din şeş, li navê şeş şervan û di navbera wan de jî Sineglazka de xew de ne. Şahzade Îvan xwe nagire, hinarkên Sineglazka maç dike, piştre jî vedigere cem hespê xwe.

Lê hesp dest bi axaftinê dike û dibêje; "Tişta ji te re hat gotin te nekir. Ji bo Sineglazka bibînî tu ketî koşkê. Niha ez nikarim xwe di ser dîwêr re biavêjim."

Şahzade Îvan hêrs dibe, qamçiyekê li hesp dixe û dibêje; "Em nikarin bi şev li vir bin, ger na wê me bikujin."

Hesp ku ji ber êşa qamçiyan aciz dibe bi yek çîvê di ser dîwêr re derbas dibe; lê dema li zengilekî ser dîwêr dikeve, her der tevlîhev dibe. Sineglazka dema ji ber vî dengî şiyar dibe yekser dizane ku tiştêk bûye. Bang dike: "Rabin...rabin, kelûpelên me didizin!"

Sineglazka, bi duwazdeh şervanan dikeve pey şopa Şahzade Îvan. Hespê Îvan wek difire diçe. Piştî bi demekê digihin holika wê pîra ku herî dawî pêre axifî bû. Li wir hespê xwe diguhere û dîsa birê dikeve. Îvan ku wenda dibe, Sineglazka tê û ji pîrê dipirse; "Dapîr, ti haywanek di vir re derbas bû?

"Na keça min."

"Baş e, siwarêk jî derbas nebû?"

"Na! Tu ji dûr ve hatiye, ma tu qedehek şîr venaxwî?"

"Ez dê vexwim, lê heta tê dohtin gelek wext jêre divê."

"Na na... ez dê yek ser amade bikim."

Yekser diçe, çêlekê didoşe û tîne. Sineglazka şîrê xwe vedixwe û dîsan dikeve pey şopa Îvan.

Îvan tê holika jina pîr a navîn, li wir jî hespê xwe diguhere û dîsan dikeve rê.

Dema ji wir diçe, yekser Sineglazka tê wir jî. Ji wê pîrê jî dipirse; “Dapîr, qet heywanek an jî swarêk di vir re derbas bû?”

Pîrejin dibêje: “Na keça min, hinekî bêhna xwe vede, ez hinek xwarinê ji te re xwarin amade bikim.”

“Dereng dibe, hewqasî wextê min nîne.”

Pîrejin; “Ji xwe re neke derd, yekser amade dikim.” Sineglazka, xwarina xwe dixwe û disan dikeve dû Îvan.

Îvan, tê holika pîra herî biçûk, li vir hespê pîrê didiyê, li yê xwe swar dibe û dikeve rê. Sineglazka jî piştre tê cem pîra biçûk û jê dipirse; “Dapîr! Heyvanek an jî siwarek di vir re derbas nebû?”

Dapîr, “Ne xêr, tiştek derbas nebû. Tu ji dûr ve tê, tu westiya ye, di nav toz û dûmanê de maye, ez avekê ji te re germ bikim da tu xwe bişo û hinekî paqij bikî.”

“Av germkirin demê dixwaze.”

“Ne xêr, yekser amade dikim.”

Bi rastî jî yekser avê amade dike, Sineglazka jî xwe dişo û dikeve dû Îvan. Hespê wê ji çiyakî di ser çiyayekî din re derbas dibe, di ser rubar û golan re derbas dibe. Bi vî awayî gelekî nêzikî Îvan dibe.

Îvan, dibîne ku Sineglazka û duwazdeh şervanên wê nêzîkî wî dibin, radiweste. Sineglazka bi ser hil dibe; “Dizo! Hem tu avê ji bîra min vedixwî, hem jî serê wê nagirî.”

Îvan jî dibêje; “Were em bi dirêjahiya bejna sê hespan paşve herin û li wir şer bikin, ka em bizanin kî ji me bihêz e.“

Piştî vê gotinê her du jî paş de diçin û bi şûr û mertalên xwe dest bi şer dikin. Tîrên dirêj diavêjin hev, mertalên wan dişkên, mîxferên wan kun dibin. Lê ligel ku sê caran diceribînin dîsan jî yek nikare yê dinê ji ser hesp bîne xwarê. Ji hespên xwe peya dibin û li xwarê dest bi şer dikin.

Dibe tarî, reş dikeve ew hê şer dikin. Roj derdikeve hê şer neqediya ye. Lê di êrîşekê de lingê Îvan ber kevirekî dikeve û dikeve erdê. Sineglazka, wek firsetek lingê xwe dideyne ser şûrê Îvan, şûrê xwe jî dideyne ser sînga şahzade.

Îvan dibêje: "Sineglazkaya rindik, ji dêlva tu yê şûrê xwe li dilê min bidî, wî destê xwe yê xweşik dirêjî min bike, alîkariya min bike daku rabim û maçeke xweşik bide min."

Sineglazka ji bo ku nexwestiye wî bikuje, destê xwe dirêj dike, maçekê dide wî. Li wir, li wê deşta mezin û hemû şînahî de, sê roj û sê şevan dimînin. Gustîlkên xwe didin hev."

Sineglazka dibêje; "Bizîvire welatê xwe, Tu qet bi rêyeke din de neçî! Ez jî diçim welatê xwe, li benda min be, ez heta sê salan têm qraliyeta te."

Li hespên xwe swar dibin û her yek bi rêya xwe de diçe. Îvan dema tê ser wê sêrêyaberê dibêje; "Ez vedigerim malê, lê min şopa birayên xwe nedît." Ku evna tê bîra wî gotina Sineglazka jibîr dike û dikeve ser rêya ku dinivîse; "Kî pê de diçe, jina pê re dizevice dibîne."

Piştî demekê diçe, tê ber xaniyê ku banê wê ji zêr e. Hespê wî dike hîre hîr, bi vî dengî re hespên birayên wî jî dikin hîre hîr.

Şahzade Îvan, ji hespê xwe peya dibe û bihêz li deriyê koşkê dide, temaşe dike pencereyên koşkê dihejin. Derî vedibe, keçikeke gelekî xweşik xwiya dike.

“Ooo... Şahzade Îvan, ji zû ve ez li benda te bûm... were hundir, bibe mêvanê min.” Her du bi hev re diçin koşkê. Keçik sifreyeke dewlemend amade dike. Îvan tiştekî zêde naxwe. Xwarinan dixe bin sifrê, vexwarinê jî dirjîne nav wî giyayê li wir. Piştre keçik tê wî dibe odeya ku lê raze jêre dibêje; “Tu yê li vir razî, li kêfa xwe meyzîne.“ Lê belê Şahzade Îvan keçikê diavêje ser cih, doşek dizîvire û keçik dikeve zîndanê. Şahzade xwe ditewîne û bang dike: “Ma li jêrê kesek heye?“

Ji jêr deng tê: “Şahzade Fedor û Şahzade Vasilli”

Her du birayên xwe dikişîne jor; her du jî di nav gemarê de mane, rûyên wan qermiçîne, rewşa wan perişan e. Îvan yekser dest û rûyê wan bi ava bîra Sineglazka dişo û bi vî awayî her du şahzade tên ser xwe û geş dibin.

Piştre her sê li hespên xwe swar dibin û dikevinser  rêya xwe. Piştî demekê tên ser wê sêrêyanê. Îvan dibêje: “Ez gelekî westiyam, ezê hinekî li ser van zûrçikan razêm, haya we ji hespê min hebe.” Îvan, xwe li ser wan zûrçikan dirêj dike, dikeve xeweke kûr û giran.

Îvan di xewa xwe ya giran de ye, Şahzade Fedor, ji Şahzade Vasilli re dibêje: “Eger em bi destên vala, bê sêv û bê av bizîvirin malê, Xwedê dizane bê ka dê bavê me çi ji me bike.”

Vasilli jî dibêje; “Were em Îvan bavêjin vê newala kûr, em wan sêvan û avê bibin ji bavê xwe re.”

Tişta lê difikirîn jî yekser dikin: Sêvan ji berîka Îvan derdixin, dirajin metereyê avê û wî jî diavêjin newalê. Newal hewqasî kûr e, Îvan sê roj û sê şevan ancex gehiştiye binê wê.

Îvan dema şiyar dibe dibîne ku li ber keviya deryayekê ye. Dibîne ku li derdorê ji xeynî esman, derya û tenê dareke berûyê, tiştekî din nîne. Di bin darê de jî çend çêlikên çûkan hene ku ji ber pêlên deryayê li hev kom bûne û pernisî ne.

Şahzade Îvan, yekser radije çûkan û wan dixe nav hêlîna wan a li ser darê. Piştî bîstekê derya radiweste, dayîka wan Nagai vedigere hêlînê û ji wan dipirse; "Ma pêlên deryayê zerarek da we, tiştêk bû?" Çêlik dibêjin: "Na, tu xemgîn mebe dayê, vî mirovî em rizgar kirin û bi çakête xwe em parastin."

Piştî wê Nagai ji Îvan dipirse: "Çawan bû ku tu hatî vir?

"Ji bo wan sêv û ava ku min dê bibira ji bavê xwe re da ew bibin, birayên min ez avêtim vê newalê."

"Te çêlîkên min rizgar kirine, çi dixwazî ji min bixwaze? Zêr, zîv, kevirên bi nirx."

"Qet tiştekî ji wan naxwazim, pêwistiya min ne bi zêr, zîv an jî kevirên bi nirx heye, ez tenê dixwazim biçim welatê xwe."

Nagai gotiye: "Here du bîdonan bibîne, wan tejî goştê xwarinê bike."

Îvan, du bîdonan dibîne; heta jê tê qazên berî dikuje, wan dixe vîdonan û baş tije dike. Tîne yekî dideyne ser milê rastê, yê din dideyne ser milê çepê yê Nagai, ew bi xwe jî li naverastê siwar dibe û difirin. Gelekî ber bi esman de bilind bûne, dema çûk dibêje "qîq" şahzade parçeyek goşt dixe devê wê.

ЧН

Hewqasî firiyane goştê wan ê di bîdonan de xilas bûye. Dema çûk gotiye, “qîq”, Îvan kêra xwe ji berîka xwe derxistiye û parçeyêk goşt ji rahnê xwe yê rastê jêkiriye û dayê. Careke din jî dema gotiye “qîq” vê carê ji rahnê xwe yê çepê parçeyek goşt jêkiriye û dayê. Êdî di ser welatê Îvan re difirin. Wextê careke din çûk dibêje “qîq” Îvan vê carê ji sînga xwe parçeyekî jêdike û didiyê.

Êdî çûk nizm dibe. Nagai dibêje: “Te di rê de ez baş bixwedî kirim, qet birçî nemam. Lê ew parçe goştê dawî gelekî xweş bû.” Li ser vêna Îvan, wan ciyên laşê xwe pêşan dide ku goşt jê jêkiriye. Nagai yekser her sê parçeyan ji devê xwe derdixe, dide wî û dibêje; “Te ji ku jê kirine deyne wir.“ Dema biya çûk dike yekser birînên wî tên girtin û baş dibin.

Nagai, “Êdî ji ser pişta min peya be“ û berdewam dike: “Divê ez vegerim mala xwe, rêya min dûr e!“ Îvan peya dibe nabe çûk bilind dibe û ji ber çavan winda dibe. Îvan jî berê xwe dide mala xwe.

Îvan, dibihîze ku Şahzade Fedor û Şahzade Vasilli sêvên xortaniyê û ava çavan anîne dane bavê wî. Bav wek berê ciwan bûye û çavên wî jî wek berê dibînin. Îvan, ne li bav û ne jî li dayîka xwe digere. Diçe meyxane bi meyxane digere û bi serxweşan re hevaltiyê dike.

Di vê navberê de, li welatekî gelekî dûr du kurên Sineglazka çêdibin. Çîrok jî evna ye, roj çine bi saetan mezin dibin. Sê sal heta mirov çavê xwe bigire û veke derbas dibin. Sineglazka ligel artêşê xwe her her du kurên xwe dikeve ser rêya welatê Îvan.

Piştî zemanekî digihin qraliyeta bavê Îvan. Li deştê çadirên xwe vedidin, çadireke spî ji bo Sineglazka vedidin. Rêya çadira Sineglazka jî bi qumaşekî biriqî dixemilînin. Sineglazka agahîyê ji Şahre dişîne û dibêje: “Şah, kurê xwe bide min. Eger tu nedî, ez dê qraliyeta te hilweşînim, her derî dişewitînim û te jî digirim.”

Şah gelekî ditirse, kurê xwe Şahzade Fedor dişîne. Fedor di ser qumaşê biriqî re ber bi çadira spî dimeşe. Her du kurên Sineglazka dema Fedor dibînin, diya xwe agahdar dikin û dipirsin:

“Dayê, ewê ku tê bavê me ye?”

“Na, ew apê we ye.”

“Pêwist e em çi bikin.”

“Wek heq kiriye tevbigerin!”

Dema zarok vê gotinê dibihîzin ji erdê dirajin hinek daran û li Şahzade Fedor didin. Hewqasî lê didin, Şahzade Fedor ji êşa canê xwe neçar dibe bireve.

Sineglazka agahiyeke din ji Şah re dişîne: “Kurê xwe bi de min!”

Tirsa Şah zêdetir dibe, vê carê jî kurê xwe yê navê Şahzade Vasilli dişîne. Vesilli di ser qumaşê biriqî re ber bi çadira spî dimeşe. Her du zarok dema Vasilli dibînin, dîsan ji diya xwe dipirsin: “Dayê yekî din tê, ma ew bavê me ye?”

“Na! Evna jî apê we ye. Wek heq kiriye tevbigerin!”

Dema zarok vê gotinê dibihîzin ji erdê dirajin hinek daran û li Şahzade Vasilli didin. Hewqasî lê didin, Şahzade Vasilli ji êşa canê xwe neçar dibe bireve.

Sineglazka, cara sêyem agahiyê ji şah re dişîne û dibêje; "Kurê xwe yê biçûk, Şahzade Îvan bibîne! Ger tu nebînî, ez ê qraliyeta te bi ser te de hilweşînim!"

Şah ji tirsan sorumor dibe û bangî kurên xwe Fedor û Vasilli dike. Ji wan re dibêje herin Îvan bibînin. Her du Şahzede dema fermana şah dibihîzin, tên li ber Şah li ser kabokan rûdinên û bê çawa sêv û avê ji Îvan distînin, wî çawa diavêjin newalê ji Şah re dibêjin.

Dema Şah vêna dibihîze, gelekî xemgîn dibe û çavên wî tejî girî dibin. Di demekê de ku ev tişt li koşkê diqewimin, Îvan li pêş, hevalên wî yên serxweş li pey, diçin çadira spî ya Sineglazka. Zarok, dema vanan dibînin, ji dayîka xwe re dibêjin; "Dayê serxweşek tê ku komek serxweş jî ligel in."

Sineglazka ji kurên xwe re dibêje; "Herin destê wî bigrin bînin çadirê. Ew bavê we ye, bê sebeb sê salan derd û kûl kişandin."

Zarok, wek dayîkan wan gotibû, diçin destê Îvan digrin û tînin çadirê. Sineglazka bi xwe Îvan dişo, cilên nû lê dike û dibe li ciyekî baş radizîne. Hinek meyê dide serxweşan jî û piştre wan ji stû xwe dike.

Roja din, Sineglazka û Îvan radibin diçin koşka Şah. Şahiyeke mezin tê li dar xistin. Piştre jî dawet tê kirin. Şahzede Fedor û Vasilli, ku xirabî bi birayê xwe kiribûn, ji koşkê tên qewirandin. Her du bira êdî li ku şev li wê derê sibeh jiyana xwe bi hejarî derbas dikirin.

Şahzade Îvan, qraliyeta bavê xwe naxwaze, ji bo qraliyeta xwe ava bike ligel Sineglazka diçin welatên dûr.

Çîrok jî li vir diqede.

ꕥ

## DARA Lİ BİN XEWN TÊN DÎTİN

Wextekî ji wextan lawikekî qam kurt û lawaz hebû. Zarokên derdore henekên xwe pê dikirin, bela xwe lê didan, ew biçûk didîtin û jêre digotin Çîçîlask. Bapîrekî wî hebûye ku hewl dida wî biparêze; lê bêguman her dem ne li balê bûye. Çîçîlasko car car bi tena serê xwe diçû nav daristana baranê.

Daran bedewiyeke şîn û xweşik didan daristanê, fêkiyên bi çiqlan ve daleqandî û kulîlkên wan bêhneke xweş li derdorê belavdikirin. Ji aliyekî ve jî çûk û balindeyên cor bi cor dixwendin. Çîçîlasko dema bi van ajalên dostên xwe re bû gelekî kêfxweş dibû.

Rojekê ji rojan dîsan li nav daristanê digere, li kulîlk û şînahiya pelê daran temaşe dike û berê xwe dide wan meymûn û çûkên ku xwe ji ser darekê diavêjin ser sara din. Carekê dibîne tapîrek (ajalekî wek kerên Başurê Amerîka) li binê darekê ye-yekser radiweste û dimîne ecêbmayî. Dema berê xwe dide çep û rastê xwe

dibîne çend meymûn, tîmsahek, jaguarekî reş û marekî mezin jî di xwe de ne; hemû li binê dareke mezin ketine xewê...

Evna gelekî, rewşeke gelek gelekî ecêb bûye.

Çîçîlasko, ji bo van ajalên di xewê de ji nêzik ve bibîne, bi bêdengî nêzikî darê dibe. Ji nişka ve hest dike ku hemû laşê wî teviziye; çavên wî êdî nabînin, piyên wî laşê wî hilnagirin... li erdê dirêj dibe, di xew ve diçe û dikeve nav xewn û xeyalan.

Di xewna xwe de gelek ajelan dibîne; henekan nas dike, hinek jî biyanî gelek ajel... Mirov jî hebûne; hinek ji malbata wî, merivên wî; hinek jî ku qet wan nasnake... Hemû bi hev re rûniştîne û stranan dibêjin. Piştre zilamekî pîr derdikeve holê, nêzîkû Çîçîlasko dibe û dibêje, "Navê min Sina, ez kurê Jaguar im..." Çîçîlasko bihîstibû ku mirovên wek Jaguar mamosteyên baş in. Sina, dema dest bi gotina çîrokan dike, Çîçîlasko bi dil û can lê guhdarî dike.

Çîçîlasko fêr dibe bê yekî wek Jaguar, çawa agir ji bazan didize, ji xweliya marekî mirî çawa baxçeyên fêkî çêdike, herwiha fêr dibe di wextekî de bê çawa dibe xwediyê hemû şevan.

Çîçîlasko dema şiyar dibe, dibîne ku roj çûye ava, hindik maye bibe şev. Li derdora wî ti ajelek nemaye; hemû çûne hêlînên xwe. Ew jî bi bazdan vedigere mala xwe.

Roja din, hê berî taştê bixwe, dîsan dixwaze here nav daristanê. Wê dara mezin dibîne; dema dibîne dîsan hemû laşê wî ditevize, lingên wî sist dibin, li erdê dirêj dibe û di xew ve diçe, xeweke kûr û giran.

Rojên din jî bi heman awayî derbas dibin; Çîçîlasko serê sibehê zû bêyî ku gezek nan jî bixwe diçe nav daristanê, bi zorê digihe şîvê, herwiha tê gotin ku gelek caran nedigiha jî; ji ber xwarin nedixwar jî zeîf dibû...

Sina, dikeve xewnên wî, dibîne ku Çîçîlasko zeîf û jê re dibêje, "kurê min tu gelek zeîf bûyî, lê tu di serdema mezinbûnê de yî... Min beşekî mezin ê cîhana xwe pêşanî te da; lê divê êdî tu jê dûrbikevî. Ger tu careke din werî, êdî qet niakarî jê cuda bibî..."

Çîçîlasko vedigere gund û gelekî birçî ye. Bapîrê wî xwarinekê jê re amade dike û jê dipirse: "Tu diçûyî ku? Sibehan te tiştek nedixwar, êvarê jî dema tiştek nedima tu vedigeriya yî..." Çîçîlasko her tiştî ji bapîrê xwe re dibêje; darê, ajelan, çîrokên mirovê wek Jaguar...

Sibeha din Çîçîlasko û bapîrê wî bi hevre diçin daristanê. Bapîrê xwe dibe cem darê û dibêje; "Tu here derdora darê bigere, li wan deran binêre." Lê ew bi xwe, wek Sina gotiyê nêzîkê darê nabe.

Piştî bîstekê xir xira bapîrê wî li binê darê tê, piştî kêliyekê jî ew ajel tên û li binê darê di xew ve diçin. Çîçîlasko gelekî dixwaze here binê darê lê gotina Sina tê bîra wî û nêzîk nabe...

Bapîrê wî zêde naraze, dema şiyar dibe dibêje, "Tu li ba kesî behsa vê darê nekî, dareke gelekî bi hêz e, wiha dixwiye yên ku tên li binê darê radizin jî gelekî bihêz in. Daristanê di kûrahiya dilê xwe de hîs dikin. Eger yên bêhêz werin bin vê darê mimkûne ku hêza darê werbigrin û bi vî hêzê bibin şeytan. Ruhê te bihêz e,

niha jî divê tu baş xwarinê bixwî daku laşê te jî bihêz bibe. Êdî nêzikê vê darê nebe!”

Çîçîlasko jî soz dide bapîrê xwe.

Dema vedigerin gund, pê dihesin ku zarokê bi navê Çibute nexweş ketiye. Ji ber Çibute yek ji wan zarokan bû ku herî zêde henekê xwe pê dikir, Sîska ew ji nêzîk ve nasdikir. Her çi dikin zarok baş nakin; Wek dixwiye dike ku bimire. Çîçîlasko ji çîrokên Sina şiyana başkirina mirovên nexweş wergirtibû. Destê xwe dideyne ser eniya zarok; ew jî yekser baş dibe...

Dema gundî tiştên diqewimin dibînin, qet bawer nakin ku şiyaneke wiha ya Çîçîlasko hebe. Lê piştî başbûna Çibute her kesekî nexweş diket, tên ba Çîçîlasko û ew jî wan baş dike.

Şevekê, dema di xwe de ye, mirovê wek Jaguar tê xewna wî û jê re dibêje; “Te ezmûna mezin derbas kir. Wek min ji te re got, te karî ji wê dara ku xewn li bin tên dîtin dûr bikevî. Piştre, te qencî bi wî zarokî kir ku her dem henekê xwe bi te dikir û dijminê te bû. Êdî dema ku ez sêhrên din fêrî te bikim hatiye; tu dikarî van sêhran jî ger pêwist bike di berjewendiya mirovande bikar bînî.”

Wê şevê û yên piştre jî, Mirovê wek Jaguar tê xewna Çîçîlasko; Derheqê başkirina nexweşiyên zarokan û zanyariyên di bin wê darê de gelek tiştên din fêrî dike.

Bapîrê wî, ji bo lê bimîne û bi asanî xewnên din bibîne xaniyekî ji Çîçîlasko re çêdike. Bi hev re baxçeyekî ku giyayên bi şîfa û bibin derman tê de şîn bibin çêdikin. Dijminê zemanekî Çibute jî piştî başbûnê, dibe dostê Çîçîlasko, ew jî ligel wan dixebite, Çi-

bute yê ku di demsala baranê de ruh û dilê wî wek Rûbarê Amazon radibe û pêl dide.

Zeman wek avê diherike û diçe, Çîçîlasko her roj ji rojên bihurî baştir xewnan dibîne. Van xewnan ji bapîrê xwe û Çibute re dibêje. Heta wan tiştên xweşik ku di xewnên xwe de dibîne, di xemilandina bazin û gerdanan de jî bikar tîne. Bibikaranîna mûyên biriqî, qalikên her tiştî û çermê ajelan tiştên bê wêne çêdike. Ji bo çêkirina van tiştan xewnên wî jê re dibin çavkanî. Bi vî awayî tiştên wiha diafirîne ku heta niha ne di nav qebîleya wî de û ne jî kesî çêkirine.

Lê mixabin, hinek zarokên nav qabîleyê ji van afirandinên wî aciz dibin, hesûdiyê dikin... Ji dêlva jê bixwazin ku van tiştên fêr bûye hînî wan jî bike, dibêjin, "Çîçîlasko xwe mezin dibîne, pozê wî bilind bûye..." Heta planên kuştina wî jî dikin.

Rojekê Çîçîlasko ligel bapîrê xwe diçin ji çem masiyan digrin. Masiyan tînin mal û çêdikin û di destên wan de her yekî û masiyek heye daku bixwin. Hinek zarok tên nêzîkê mala wan xwe vedişêrin ku ew li ser xwarinê rûniştin xwe bavêjin ser Çîçîlasko. Sifre dema amade dibe, Çîçîlasko ligel bapîrê xwe li ser sifrê rûdine. Ew ji nav çîtikan derdikevin tên ku xwe bavêjin ser Çîçîlasko. Lê Çîçîlasko radibe, berê xwe dide wan û dibêje, "Ez di xewnên xwe de fêrî gelek tiştan bûm, yek ji wan jî ew e kesên li pişt xwe dibînim."

Çîçîlasko axaftina xwe diqedîne naqedîne, ligel bapîrê xwe, mal, baxçe û Çibute wenda dibin. Zarok lê dinêrin ku qet tiştek nîne. Li zeviyeke vala bi tena serê xwe dimînin. Çîçîlasko, bapîrê

wî û Çibute ligel hemû tiştên xwe dikevin bin erdê û ji dereke din derdikevin ser erdê.

Rûsipiyên wî gundî ji bo ku nexweşan baş bikin, li her derî li wan digerin. Li dûrî gund wan dibînin. Ji bo ku vegerin nav gund gelekî li ber wan digerin. Piştre qebûl dikin û tên gund. Lê dijminên wan hinek dek û dolabên din ji bo wan çêdikin.

Biryar didin ku ji bo pêşwaziya Çîçîlasko, rojekê çêbikin. Lê ya rast evna kemîn bû. Li gor planên wan dê xwarinekê amade bikin û dema Çîçîlasko li ser xwarinê rûnişt, yek ji wan bi darekî mezin li serê Çîçîlasko bide û wî bikuje. Lê ji bîr kiribûn ku Çîçîlasko, neyaran jî dibîne. Xwarin amade dibe, hemû li ser sifrê rûdinin. Yek bi dizî tê û dixwaze darê xwe li serê Çîçîlasko bide. Lê ji ber Çîçîlasko wî dibîne, xwe dide aliyekî, dar li erdê dikeve û erd diqelişe.

Çîçîlasko, bapîrê wî, Çibute û hemû tiştên wan dikevin bin erdê. Ji bin erdê dengê Çîçîlasko bi kêmî tê û dibêje, “We qedrê tiştên ku me dikirin nizanî, em êdî qet venagerin...”

Êdî qet kesekî jî nema wan dîtiye.

ᘓᘐ

# GULA ÇOLÊ YA BİÇÛK

Di zemanekî de tiştekî neasayî qewimiye. Eger nebûya ma qet li vir dihat gotin? Çi wextî? Dema ku gur û berxik bi hev re dimexeltin, şÎvan li nav çîmenên şîn ligel împerator û qralan rûdiniştin û xwarin dixwarin, rojek derdiket rojek diçû ava...

Mirovek hebûye û temenê wî sed salî bûye. Bawer bikin bi rastî dibêjim, jina wî jî, ji hemû jinên ku dinasim bi tementir bûye. Van kal û pîran çi kirine, dîsan jî zarokên van çênebûne. Bêdengiyeke bêxêr di nav mala wan de hebûye. Mêrik ji bo ku zarokên wan çêbibin, xêr û bêr bikeve nav mala wan, çûye serdana hemû dêr û perestgehên pîroz. Herwiha ji hemû alim, papaz, sihîrbaz û pîrebokan dua û nivişt wergirtine. Pere, xêr û xêrat dane, İlahî dane xwendin. Lê yek ji van jî bi kêrî tiştekî nehatiye. Jinik jî wiha vala nemaye; li deriyê hemû sihîrbaz û pîrebokan daye, hîç sihîrbazek nemaye ger hefteyekê jî bi rê de çûye. Lê disan jî bê fêde bûye û zarokên van çênebûne.

Merivê kal rojekê ji jina xwe re dibêje: "Tu rabe tûrikê min amade bike, ez diçim li cîhanê digerim belkî ez bikarim zarokekî ji me re bibînim û bînim malê. Her sal derbas dibin û ez ditirsim em bimirin, wê demê dê malê me ji xelkê re bimîne. Ha ez tiştekî din jî, ji te re bibêjim, ger min qet zarokek nedî ez nayêm malê. Jiber rêyeke din nema."

Piştî vê axaftinê, radibe tûrikê xwe diavêje milê xwe û berê xwe dide rêyeke nediyar. Zêde diçe kêm diçe, dikeve nav daristaneke tarî. Di nav daristanê de rêya xwe wenda dike. Li ber darekê rûdine û sê caran xaçê derdixe (dua dike) û radibe disan di nav daristanê de bi rêyeke nediyar de dimeşe. Zêde diçe kêm diçe şikeftekê dibîne, şikeft ji daristanê jî tarîktir e. Dikeve hundirê şikeftê hinekî dimeşe, li cihekî rûdine û sê caran xaçê derdixe. Piştre radibe ku bimeşe tiştekî ku dibiriqîne li pêşiya xwe dibîne. Hêdî hêdî nêzîkê şewqê dibe dibîne evna mirovekî rîspîye û gelekî bi temen e, riyeke wî ya spî û dirêj heye tu dibê ji dema dinya çêbûye û hetan niha li wir e. Ew şewq jî şewqa çavên wî ye. Dema çavên xwe vedike hundirê şikeftê hemûyî ronî dike.

Li ber wî mirovî kitêbêk pîroz heye ku bi tîpên sor hatiye nivîsîn û nayê zanîn ji çi wextî ve li vir e, herwiha li ser kevirekî jî, mûmeke şewq sor heye. Ji mûmê dûyek derdikeve û li derdora meriv wek ewran digre. Fam dike ku evna ezîzêk e û dua dike. Yekser xwe diavêje piyên wî û ji re dibêje: "Êvar baş peder."

Peder, wek nebihîstibe dengê xwe nake. Kalo, dîsan bi dengekî bilindtir dibêje: "Êvar baş peder" Peder bi çavên xwe îşaretekê dide ku dengê xwe dernexe heta duaya xwe diqedîne. Dema dua diqede çavên xwe vedike jê re dibêje:

“Kurê min li vî cihê tarî ku hatiye jibîrkirin tu li çi digerî? Bi sedê salan e min qet kesek nedît, ez vê hêza ku tu aniye vê derê meraq dikim.”

Kalo bersîva wî dide: “Destê te maç dikim. Hêza ez anîm vir bêhêvîtiya min bû. Ez ji zû ve zewicî me, lê zarokên me çênabin, ez dixwazim dema çûm rehmeta Xwedê, zarokek li pey me bimîne.” Peder, sêvekê tîne dua lê dixwîne û pif dikiyê. Sêvê dike du qet û ji kalo re dibêje: “Tu van her du qetên sêvê dibî, yekî dixwe, yekî jî didî jina xwe, pişt re tiştên ku biqewimin bila te şaş nekin!” Herwiha bê kîjan aliyê jinê ye, wê jî diyar dike.

Kalo, diraje herdu qetên sêvê, destê peder maç dike û ji şikeftê derdikeve, dikeve nav daristanê. Piştî rêyeke dûr û dirêj ji daristanê derdikeve û diçe nav zûrçik û çîmenan. Li wir tî dibe, lê av nine, ew jî aliyekî sêvê dixwe. Lê piştre ferq dike ku aliyê jinikê xwariye.

Jiber ku gelekî westiya bû, li ser zûrçik radize û dikeve xewê. Kalo dema dikeve xewê melekek-ferîşteyek tê ber sere wî û temaşeyî dike. Dema ji xew radibe mucîzeyekê-tiştekî ecêb dibîne! Ku zarokekî biçûk li cem e, hem digirî hem jî tiliyên xwe yên biçûk dilivîne...

Ferîşte, hinek av û rihana li ser hatiye xwendin tîne û zarokê têde helal dike; nave wê jî dike “Gula Çolê ya Biçûk”. Kalo vê keçikê hembêz dike, bêhn dike, maç dike û ji kêfa çavên wî tiştekî din nabînin. Yekser radibe û dikeve rê, hewl dide ku di zûtirîn wext de biçe cem hevsera xwe û kêfxweşiya xwe pê re parveke.

Kalo dema tê malê yekser li ber derî teştek hevîr dibîne, keçikê dixe teştê û ew b xwe jî dikeve hundir û bangî jina-hevsera xwe

dike, "Were, were, were li vê keçika ku Xwedê daye min temaşe bike, pora wê zeriya zêr e, çavên wê wek stêrkan dibiriqin."

Herdu bi hev re derdikevin û li teştê dinêrin, keçik nîne. Li der doran temaşe dikin, berê xwe didin kadînê lê keçik nîne, wek erd qelişîbe û keçik ketibe bin erdê.

Kalo destên xwe dideyne ser serê xwe û difikire; tiştekî weha çawan dibe? Min bi destên xwe keçik xist teştê û danî ber derî, evna baş li bîra min e, lê keçik nîne. Ji xwe bi xwe re dibêje, "Gelo çi bûye? Ferîşte birebe? Cinan revandibe? Tiştekî weha çawa dibe?"

Lê belê ne ferîşte, ne jî cinan biriye...Binêrin ka çi bûye:

Wextê ku kalo keçik xist nav teştê, keçik digiriya, yekser wê demê bazek di wir ve derbas dibe, temaşe dike ku pitikek digirî. Tê keçikê ji teştê derdixe dixe nav piyên xwe û difire dibe cem çêlikên xwe. Di hêlîna xwe de odeyeke biçûk çêdike û tê de radizîne. Wê jî ligel çêlikên xwe bi xwedî dike. Çêlik gelekî baş lê dinêrin û dema dibe serma bi baskên xwe wê diparêzin.

Pêwiste bê zanîn ku dara hêlîna baz li ser e di nav vê daristana bi tirs û xof de ye. Ev dar jî nêzik bîrêkê ye, di bîrê de ejderhayekî diwazde serî heye, ava bîrê jî bi jehr e. Her ku çêlikên baz mezin dibin, ber firê dikevin, ejderha tê wan dixwe. Baza bêçare nikare tiştekî bike û her wext kedera firîna çêlikan pê re dimîne.

Çêlikên ku di hêlînê de êdî mezin bûne, çaverêne ku roj hilê, herin ser daran û li ser serê çiyan bifirin. Hê tav derneketiye carekê dibînin ku ava bîrê dike loqe loq, dikele û têde du serên ejderha derketin. Hewl didin ku xwe bavêjin çêlikan. Lê di heman demê de erd diheje, dibe gurme gurma birûskan û ferîşteya mezin

şûrek di destê wê de li ser ewrekî zêr êrîşî ejderha dike; şûrê xwe carekê rast-çep, carekê jî çepe-rast diavêje û her du seriyan jêdike. Piştre du seriyên din ên bi xof derdikevin. Bi heman awayî wan jî jêdike. Yên ku mayîn ew jî derdikevin û wan jî bi heman şêwazî jêdike.

Vêca her der dibe xwîn û jehr, dar û berên li derdorê hişk dibin, ew newala xweşik dibe çol û vala dibe. Ferîşteya mezinserferîşte li vêna jî fikiriye, avekê ji behiştê bi xwe re tîne û li wan derdoran vala dike. Dar û ber bi vê avê dîsan şîn dibin, newal wek berê xweşik dibe û dixemile.

Baz serê sibehê dema roj hilat tê hêlîna xwe. Dibîne ku ew bîra bêxêr nîne, çêlikên wê di xewê de ne, bi kêf û coş diqîre bang dike, dengê wê li her derekê tê bihîstin. Di wê çoşê de çêlikên xwe ji xew radike. Baza dayik ji çêlikên xwe dipirse: "Kî hat? Kê ew xêr kir?" Çêlik çavlixew dibêjin: "Em di xew de bûn haya me ji tiştekî nîne." Baz, dibîne ku çavên keçika por zer wek tava rojê dibiriqin. Êdî fam dike ku çi bûye, wê keçikê kiriye.

Baz piştî wê radibe bê navber dixebite, kulîlkên herî baş ,giyayên herî nerm tîne di hêlînê de dergûşeke baş ji keçika xweşik re çêdike. Dema ba tê dergûş dileqe, Gula Çolê ya Biçûk kêfxweş dibe. Baz wek çêlikên xwe li keçikê dinêre, jê re dibe hem bav û hem jî dê.

Sal bihurîne Gula Biçûk mezin dibe, xweşiktir dibe. Serê sibehê bi tîrijên rojê re şiyar dibe, şev bi dengê bilûra şÎvanên li daristanê û di bin şewqa tava heyvê de, ligel bayê hênik radize.

Piştî çend rojan, rojekê radibe, deriyê odeya xwe vedike û yekem car diçe derve. Dema derdikeve derve cîhan hemû ronî di-

be. Ji xeynî roja heyî rojeke duyem jî derdikeve. Çiya sor-mor dibin, deşt û daristan şîn dibin, kulîlk hevûdû hembêz dikin, tu dibê qey hemû xweza sipehîtiya Gula Çolê slav dike.

Ew roj rojên din, meh û salên din dibuhurin. Gula Çolê dibe çarde salî. Hewqasî xweşik bûye ku li jêr vê rojê, li ser vê cîhanê yeka din wiha nebûye. Dibên sipehîtiya wê bi peyvan nedihat ravekirin.

Di çarde salên bihurî de hîç miroveki ew nedîtiye, ew jî nizane paşa çine, bajar çine. Di çarde salên bihurî de hertim di nav kulîlkan de û ligel pirpirînek û çûkan reqisiye.

Rojekê ji rojan dengê lûle û nalên hespan li daristanê deng vedaye. Li her çar derdorên daristanê dengê nalên hespan tê. Li gor çîrokê şazadeyê-paşayê wî welatî ligel hevalên xwe tê nêçîrê, dikeve pey gakoviyekê û tê nav daristanê, ev cihê xweşik ku qet di xewna xwe de nedîtiye û lingê mirovan jî lê neketiye.

Şazade li hemberê vê sipehîtî û xweşikiyê mat dimîne, nêçîra xwe jibîr dike. Hinekî guhê xwe dide vê bêdengiyê. Herçiqas ji dengê hesp û kûçikan hezdike jî, lê ev bêdengî zêdetir bala wî dikişine. Li derdora xwe dinêre, dibîne ku di nav daristanê de şewqek xwiya dike. Bi ber de diçe nêzikî dibe, dibîne li ser darekê hêlînêk, di hêlînê de çêlik in, li cem wan odeyek wek dergûşan heye. Yekser berê tîr û kevanê xwe dide wir. Dike ku tîr bavêje, şewqeke zêde li çavê wî dixe. Ji bo ku çavên wî kor nebin destê xwe dide ber çavên xwe û tîr-kevanê xwe jî diavêje û dikeve xwarê. Di nav tiliyên xwe de wê Gula xweşik û sipehî dibîne. Radibe, xwe bi ser hevde tine û işaretê dide ku Gula Xwezayê were

cem. Lê jiber Gulê heta wê rojê kesek nedîtiye, hinekî paş de diçe û xwe vedişêre.

Şazade paş de dizîvire, lê ne wek hatinê! Vê care evîn ketiye dilê wî û bi hêvî ye, wek şÎvanên pez ji çiyê dibin mal, westiyayî û gêjo-mêjo dimeşe. Li ser rê rastî du hevalên xwe yên nêçirê tê. Evna, alîkariya şazade dikin û wî dibin koşka paşatiyê.

Roja din dema dibe sibeh, agahiyeke koşkê li tevahiya welat tê belav kirin. Di agahiyê de tê gotin ku her kî wê keçikê li nav daristanê ji ser wan her du daran bîne, ew dê li ba paşa wek şêwirmend li koşkê, heta ku bijî tê xalat kirin. Li gor çîrokê jineke pîr û piştxwar tê dîtin û dibêje: "Li vî welatî tenê ez dikarim wê keçikê bînim." Hinek henekên xwe bi jina pîr dikin. Dibêjin: "Tu wek pîrebokan î, bo anînê keçikê tê bibe asteng jî.".

Lê dema jina pîr pêdagiriyê dike, peywirdarekî bi temen dibêje, fermana koşkê ye, dive em vê jina pîr bibin. Jinê li otomobîlekê swar dikin û dibin koşkê. Jina pîr li koşkê diçe hemberê Şah.

Şah jêre dibêje: "Te gotiye ez ê keçikê bînim."

Jina pîr dibêje: "Xwedê te biparêze, erê ez tînim."

Şah: "Baş e, de bîne"

Jina pîr: "Divê hûn beroş û sêlingekê ji min re bînin."

Tiştên ku jinikê xwestine tînin. Jina pîr, lîwayek leşker û şazade bi hev re ber bi daristanê birê dikevin. Jina pîr, wek ku şahî be, di nav leşkeran de li beroşê dixe û dimeşin. Dema tên daristanê şazade û leşkerên wî nakevin nav daristanê. Jina pîr bi tenê dikeve nav daristanê û dimeşe.

Tê binê wan darên ku Gula Çolê li ser e. Li bin darê agirekî pêdixe, sêlingê ters-berevajî datîne û beroşê dideyne ser. Beroş dikeve xwar. Gula Çolê, temaşe dike ku lingê hesinî berevajiye. Bangî jinê dike û dibêje: "Biroş wiha nasekine, sêling ters e." Jina pîr, sêlingê dizîvirîne lê disan ters datîne, beroş dîsan ji ser dikeve xwar. Gula Çolê, disan lê dinêre ku ew tersî berdewam e. Xwe nagire û careke din bangî dike: "Disan ters e, wiha nabe." Jina pîr dibêje: "Keça min ka were alîkariya min bike, bi gotinê nabe." Gula Çolê, ji ber ku heta wê demê kes nedîtiye, ti dek û dolaban jî nizane, ji sere dare tê xwar û sêling rast dike. Dema tê xwarê, jina pîr yekser wê hembêz dike û li pişta xwe dike. Herdu bi kulekî tên cem şazade û leşkeran. Şazade dema Gula Çolê dibîne tê bale û destê xwe dirêjî wê dike. Ligel Şazade neh prenses jî tên. Gula Çolê bi cilûbergên zêr û incî dixemilînin û li otomobîlê swar dikin. Ji xeynî bêhnvedaneke kurt qet nasekinin heta bi koşkê.

Dema tên koşkê, Şazade, ji Gula Çolê re dibe hevkar daku ji otomobîlê peya bibe û wê wek prensesekê li ba xwe rûdinênê. Şah û Jinşah dema berê xwe didin Gula Çolê kur û ciwaniya wan tê bîra wan.

Sê roj û sê şevan şahiyek tê kirin, Rojekê navberê didinê, dîsa sê roj û sê şevan dewam dikin. Ne bêjin tu çawan dizanî? Herçiqas ez destpêka şahiyê ne li wê derê bûm jî, heta dawiyê li wir bûm

## ZAROKÊ JÎ WELATÊ KÎNÎKAN ZÎVÎRÎYE

Heştsed sal berî niha li ber qeraxa rûbarê Neath ê Gallera Başûr zarokekî bi nave Elidyr dijîya. Temenê zarok diwazde salî bûye. Dayîka wî her tim dixwest ew bibe rehîb. Ji bo vê mebestê jî ew teslîmê mamostayekî hişk-tund kiribû. Mamoste ji xeynî ku her roj lê dida tiştekî din nedikir. Elidyr, rojekê dersên xwe amade nake. Loma newêre here cem mamostayê xwe, direve diçe dikeve şikeftêk tarî ya li ber qeraxa rubar. Li wir du rojan dimîne.

Roja yekem wiha difikirî; “Birçîbûn ji lêdanê baştir e.” Roja duyem jî got; “Gelo birçîbûn ji lêdanê baştir e?” Roja sêyem jî got; “Lêdan ji birçîbûnê baştir e.” Biryara xwe dide bizîvire cem mamostayê xwe, dibîne ku du merivên kinik-bejin kurt-cuce dikevin şikeftê û di dest wan de selikên tejî fêkî û şûseyên teji şîr hene. Cuce van didin Elidyr û dibêjin: “Em wiha difikirin kû lêdan jî, birçîbûn jî ne tiştên baş in.” Elidyr heta wê rojê gotineke din a hewqasî baş nebihîstibû. Yekser wan fêkiyan dixwe û şîr jî vedixwe.

Dema zikê xwe têr dike û devê xwe paqij dike, herdu cuce jêre dibêjin; “Me ji te hezkir, ger tu bi me re werî em te dibin welatekî tejî leyistik û cihê kêfxweşiyê.” Elidyr, pêşniyara wan ji rûbirûbûna mamosteyê xwe baştir dibîne, yekser bê hîç gumanek bi wan re dikeve rêyeke bi lat û di şikeftê de ber bi jor ve diçin.

Rê diçû welatekî tejî darên nû kulîlkên wan vedibûn, rûbarên bêwêne û çayir û çîmenên xweşik. Di nav çayir û çîmenan re rubar diherikin. Ev welat welatekî xweş bû û ji hemû welatên din cûda bû. Tîşkên rojê û heyvê nebûn. Roja wê nîv ronahî, şevên wê jî reş û tarî bûn. Cuceyekî ji van Elidyr bir cem şahê vî welatî. Şah merivekî rûxweş bû. Şah derbarê jiyana Elidyr li cîhanê (welatê wî) de pirsan jê dike û dibêje; “Pêwiste, tu li ser dersên xwe baş kar bikî, em ê jî baş li te xwedî derkevin. Bingehê fêrbûnê êş e. Lê fêkiyên wê şêrîn in. Eger fêrbûn ji bo prensekî baş e, ji bo rahîbekî jî baş e.” Ev gotinên han bo Elidyr gelekî maqûl bûn. Wî jî soz da ku gelekî guhê xwe bide dersên xwe.

Elidyr, salekê bi giştî ligel xelkên cuce yên vê vê Cîhanê jiya. Baş guhê xwe dida dersên xwe û ligel kurê şah bi gokê dileyist. Mirovên vî welatî hemû cuce bûn. Lê ji mirovên din baştir bûn. Jiyaneke wan a navxweyî ya gelekî maqûl û xweş hebû. Hespên wan, tajiyên wan û ajalên wanên din ên corbicor hebûn. Hemû jî wek wan cuce bûn. Goşt û masî nedixwarin. Tenê şîr dixwarin. Ya herî girîng ew bû ku hemû narîn bûn, gelekî ji hev hezdikirin û bi hev re rast bûn. Şah ji wî re digot: “Rewişta-exlaqê baş rêgeza me ya bingehîn e û ew bingeh ji bo te jî her wiha ye.” Elidyr, rêgezên li vî welatî gelekî maqûl dîtin. Jiber azadî, kêfxweşî û kêf

hebû û jiyana li vî welatî ji ya hemû welatên din ên cîhanê xweştir bû. Ew jî ligel kesên din baş tevgeriya û bû xwediyê exlaqekî baş.

Elidyr, di hundirê salê de çend caran çû welatê xwe û hat. Cara pêşî ligel wan hevalên ku ew anîbûn çû û hat, piştre ku rê zanî bi tenê jî diçû û dihat. Çend caran jî çû cem dayîka xwe. Ji dayîka xwe re behsa başiya wî welatî û jiyana li wir dikir. Dema behsa kelûpelên xwarinê yên zêrin û goka zêrin a ku pê dileyist dikir, dayîka wî mat dima.

Dayîka Elidyr, gelekî hejar bû, bi zehmetî jiyana xwe derbas dikir. Ji bo vê yekê jî dema behsa gok û tiştên din ê zêrin dihat kirin, ji xwe re digot; "Çiqas xweş e dema mirov bibe xwediyê gokeke wiha xweşik." Carekê ji kurê xwe re got: Kurê min tu ji dayîka xwe hez dikî?

Elidyr jî got; "Erê, bêguman"

Dayîka wî; "Ez tiştekî ji te bixwazim, tu dikarî bi cîh binî?

Elidyr got, bê guman, lê dema dayîka wî behsa anîna goka zêrin kir, gelekî xemgîn bû. Piştre fikirî, ku li wir zêr gelek e û ne di bin kontrola muhafizan de ye jî. Loma ew xwesteka dayîka xwe qebûl kir.

Roja din dema ligel kurê Şah dilîzin, gokê werdigre û berê xwe dide rêya cîhanê. Piştî bi kêliyekê jî baz da. Wextekî zêde derbas nebû, dibihîze ku dengê lingên wî taqîb dikin tên. Dema her der ronî bûn, fam dike ku ev dengê lingê wan her du hevalên wî yên cuce ye. Bi dengên xwe wek çûkan bang dikirin, digotin gokê bîne... Biçûk bûn lê dîsan jî zû gihiştibûn wî. Elidyr, dema digihe ber deriyê mala dayîka xwe, lingê wî li kevirekî dikeve, dikeve û gok ji dest diçe. Cuce yekser gokê werdigrin.

Elidyr; "Bibûrin, dayîka min xwest, ji bo wê min kir, ev tiştekî mirovî ye."

Cuce dibêjin: "Başe ku em ne mirov in û ne bêexlaqin" û bi çavekî biçûk berê xwe didin Elidyr piştа xwe didinê û wenda dibin. Elidyr, bi pey wan de bang dike û dibêje; "Bibûrin, min bibin ba xwe" lê cuce qet guhê xwe nadinê. Elidyr, şerm dike, digirî lê tiştek naguhere.

Elidyr, salekê bi giştî diçe ber qeraxa rûbar û wê şikeftê lê rêya ku diçe wê cîhanê nabîne. Hewqasî aciz dibe destê xwe li wê xîza ber rûbar dixe heta xwîn jê tê.

Lê wek hemû birînan ev birin jî bi dirêjahiya zeman baş dibe. Elidyr dîsan diçe cem mamoste û dersên xwe. Piştî ku gelek sal derbas dibin, bi navê Eliodorus dibe rahîb. Heta ku pîr û kal dibe jî her tim behsa jiyana xwe ya li wê cîhanê dike. Dema behsa çawahiya wendakirina baweriya wan kesan a bi wî dikir, qet nediqedand û bi girî gotina wî dihat birrîn.

ꕥ

# KÎSO Û KOVÎ

Rojekê nêçirvan rastî keriyek Gakovî-Mambiz tên, teqe li wan dikin. Yek ji wan birîndar dibe, lê ya birîndar û yên din jî rizgar dibin. GaGakovîyê birîndar her diçe birîna wî girantir dibe. Lê jiber ji nêçîrvanan dûr ketiye hinekî rehet dibe. Lê dîsan jî nikare ni rehetî bimeşe.

Kêm diçe zêde diçe, li ber binarê çiyayekî rastî kîsoyekî tê. Kîso berê xwe daye çiyê û hino hino dimeşe. GaGakovî diçe û li pêşiya kîso radiweste. Kîso dema Gakovî dibîne, ew jî serê xwe radike û radiweste. Temaşe dike ku Gakovî xemgîn xemgîn difikire. Bi dengekî bilind ji Gakovî dipirse: "Kekê Gakovî ew çi hale, çi bi serê te hatiye? Çima wiha xemgînî?" Gakovî: "Qet nebêje, neçirvanan teqe li min kirin hevalên min filitîn, ez jî bi giranî birîndar bûm." Kîso, stoyê xwe dirêj dike, li der dora xwe dinêre û dibêje: "Tu zêde xemgîn nebe, ev halê me nêçîrvanan e, me gelek caran karên wiha kirine." Piştî vê axaftinê êdî li ser meşa xwe

berdewam dibe. Gakovî: “Bi rastî ez bi vê birînê namirim, lê ditirsim ku ez bi nêçîrvantiya te bimrim.”

Gakovî, piştî bîsteke din ku hinekî bêhna xwe veda, radibe dîsan dikeve rê. Dema hinekî pêş de diçe dibîne ku li ser rê Kîso ji bo geyayêkî bilind bîne xwarê koka wê dixe. Lê jiber ku geya gelek qalin e, nikarê bîne xwarê. Gakovî yekser diçe cem geya, devê xwe diavêjiyê û tîne xwarê, dibêje: “Bi rastî nêçirvanên wek te gelekî bihêz in. Herwiha hun qet derewan jî nakin!”

ꕥ

# ÊZİNGÊN MİN

Di serdemekê de li gundekî bi daristan xortek hebûye. Xort ji çend rojan carekê diçe nav daristanê barek êzing jêdike û dibe bajêr difroşe. Dîsan rojekê ji rojan diçe daristanê û barek êzing jêdike û li kerê xwe bar dike. Sibe zû berê kerê xwe dide rêya bajêr. Dema hinekî diçe li ser rê rastî kalekî tê. Tê cem kalo, piştî slavekê dibêje; "Apo tu diçî ku?" Kalo dibêje; "Ez diçim bajêr." Xort dibêje; "Ez jî diçim bajêr, were em bi hev re herin." Kalo jî dibêje, "Ji xwe ez jî li hevalekî digeriyam."

Ker li pêşiya wan û ew bi pey de ber bi bajêr dimeşin. Behsa mirovên nas û bi navûdeng û kiryarên wan dikin. Herwiha behsa fermanên Xwedê, gotinên Pêxember û mezintiya wan dikin. Gelek zeman derbas dibe, lê hê jî rê gelek maye. Jiber rêya bajêr rêyeke dûr û dirêj e. Kalo êdî hêdî hêdî diweste, lê nikare ji xort re bibêje were em rawestin, bêhna xwe berdin. Jiber dizane xort hewl dide heta zûtir ebigihe bajêr û êzingên xwe bifroşe.

Kalo, hinekî difikire û cesaretê dide xwe û ji xort re dibêje:

"Gelo tu vî barê êzingan bi çiqasî difroşî?" Xort: "Ez bi deh lîreyan difroşim."

Kalo: "Ê baş e ez gelekî westiyam, ez ê deh lîreyan bidim te û li kerê te swar bibim."

Xort: "Çêdibe lê ker barkirî ye, ez ê çi ji êzingan bikim?"

Kalo: "Ma tu van êzingan nabî li bajêr nafiroşî? Wek te firotibin min. Ez ê jî barê te deynim, perên te bidim te, li kerê tc swar bibim û disan bi hev re biçin bajêr."

Xort: "Başe lê êzingên min li vir dimînin, ez ê çi ji wan bikim?"

Kalo: "Tu wan ezingan difroşî min, fermo ji te deh lîreyên te." Xort, perê xwe werdigre lê dîsan jî fikra wî zelal zelal nabe. Dibêje; "Apo ma êzingên min dê li vir bimînin, çawa dibe?" Kalo, dibêje; "Êdî te êzingên xwe firotin, perê xwe wergirtin, êzingan deyne daku ez jî swarbim, êdî ez nikarim bimeşim." Xort dibêje: "Apo ez ji te fêm dikim, tu li kerê swar dibî, em bi hev re diçin bajêr, lê êzingên min?"

ꕥ ꕤ

## TU DİKARÎ QAZÊ BİPİRTİKÎNÎ

Hebû nebû, padîşahek û wezîrê wî hebûn. Rojekê ev padîşahê han bêzar bûye, rabûye cil û bergên xwe guherîne û ligel wezîrê xwe ketine nav gel. Bi rê de dimeşin, dibînin ku kalekî rêncber li nav bax û bistan kar dike. Padîşah jê re dibêje: “Merheba”

Rêncber jî dibêje: “Merheba, ji te re jî”

Padîşah jê dipirse: “Te şeş xistin ser şeşan?”

“Min şeş xistin ser şeşan, lê min nikarî bighînin sîh û didûyan.”

Padîşah dîsan jê dipirse: “Çima tu zû ranebûyî?”

“Ez zû rabûm lê xelkê bir.”

Padîşah dîsan dipirse: “Ger ez qazekê ji te re bişînim, dikarî bipirtikînî?”

“Belê belê, ez hostayê vî karî me.”

Wezîr ji van axaftinan tiştekî fam nake û dimîne ecêbmayî. Dema vedigerin koşkê, Padîşah ji wezîr dipirse;

"Te tiştek ji van axaftinên me fam kir."

Wezîr:

"Na nexêr, min tiştêk jê fam nekir."

Padîşah:

"Madem wiha ye, ji te re çil roj wext. Fam bike ka evna tên çi wateyê. Ger tu piştî çil rojan dîsan fam nekî ez ê wezirtiyê ji te bistînim."

Wezîr piştî vê diçe mala xwe, difikire, serê xwe dibe û tîne, lê fam nake ka tê çi wateyê. Nexweş dikeve, ji xwarin û vexwarinê dibe. Rojekê keçika wî ya biçûk tê balê, dibîne ku rewşa bavê wê nebaş e. Dipirse: "Ev çi hal e yabo? Çi derdê te heye?" Bavê wê pêşî naxwaze lê piştre meselê jê re dibêje.

Keçik: "Yabo, çareserî asan e, tu here ba wî mirovî, çend quruşan bidiyê, bila meselê ji te re bibêje."

Wezîr, fikra keça xwe rast dibîne, hinek zêr dixe heqîbxurcika xwe û rast diçe cem zeviya rêncber. Rêncber li nav zeviyê karê xwe dike. Nêzikî dibe û jê dipirse: "Ez ê tiştekî ji te bipirsim, ger tu rast ji min re bibêjî ez ê heqîbek zêr bidim te. Wê rojê du mirov bi cil û bergên derwêşan hatin ba te, we ji hev re çi got?"

Rêncber dibêje: "Me destpêkê slav û merheba da hev. Min, ji hal û tevgerên wî zanî ku mirovekî zana ye. Piştre ji min pirsî; "Te şeş danîn ser şeşan?" Min jî got; "Belê, 'min şeş danîn ser şeşan lê negehişt sîh û didûyan." Wateya vêna jî ev bû: "Tu di rojekê de diwazdeh quruşan qezenc dikî?" Min jî got; "Erê, ez diwazdeh quruşan qezenc dikim, lê sîh du diranan têr nakim." Tiştekî din jî ji min pirsî û got: 'Tu çima zû ranebûyî?" Wateya

wê jî ev e: "Tu çima zû nezewicî? Eger tu zû zewicîbûya, kurên te wê hebûna û niha wan kar dikir, te jî di van salan de bêhna xwe berdida." Min jî got: "Ez zû rabûm lê xelkê birin." Wateya wê jî. "Ez zû zewicîm, lê kurên min nebûn, keç bûn, ew jî bûn bûk, yanî xelkê birin." Dilê wî bi min şewitî û got: "Ger ez qazekê ji tere bişînim, tu dikarî bipirtikînî." Min jî got; "Erê ez hostayê vî karî me. Wiha xwiya ye ku ew qaz tu yî. Ger tu ne qaz bûya çi karê te li vir hebû."

Rêncber hemû zêr-pereyan werdigre. Wezîr bi dilekî xweş diçe ba padîşah û jê re wateya wan axaftinan dibêje.

Padîşah: "Ger ti neçûbaya cem rêncber û nehatibana pirtikandin, te nedikarî van tiştan ji min re bibêjî," û dîsan jî wezîr ji kar diavêje û kîsikek zêr jî ji rêncber re dişîne.

ꕤ

# NOKA ŞİKESTÎ

Zemanê berê, dema bêjing di nav kayê de, wextê cin di serşoyên kevn de dileyistin... Mirîşkên birçî di xewnên xwe de genim didîtin, nexweşan hinar didîtin. Ez jî ji wextê bûm ez, her tim zer dibînim. Ez çi bibêjim ev zeriya han zerbûna hêkê ye? Ya zerdelokê ye? Ya zêr e...? Nizanim. Lê dema berfa çiyan vê zeriyê dibîne dihele.

Madem zêr zer e, her zeriyek jî zêr bûya, den tejî zêr bibûya; min jî bikarîbûna bi van zêran bajarekî çêbikim ligel çil û heşt gundan, di her malekê de heştê û heşt ode û baxçeyên Babîl û avên kaniyan hebûna. Lê çi bikim, di dil de heye lê ne di dest de ye... Ger çar hezar deveyên min hebûna li deşteke rast de, bîst hezar balindeyên min li esmanan bifirîna; Herwiha min bikariya pênc deh kilorên rûn di taweyê bihelanda. Lê çi bikim, di dil de heye, lê ne di dest de ye...

Hezar û pêncsed çêlekên min bi golikan ve, dused cêriyên min dest bi hine, not şÎvanên min pişt bi qame hebûna. Lê çi bikim, di

dil de heye, lê ne di dest de ye... Bi gotinan keştiya penîr naçe, vêca keştiyên mezin dê çawa herin? Ger biçe, dîsan çîrok diçe. Ya baş ev e ku em dev ji van tiştan berdin û werin li ser tifika xwe rûnin û li kêfê xwe binêrin.

Hebû nebû, evdên Xwedê gelekî zêde bûn; Dema devehan serî jêdikirin, kêç berber bûn, min xweşik dergûşa dayîka xwe dihejand, Lawikekî keçel hebû...

Rojekê ji rojan Lawikê keçel, ji xwe re li kuç û kolanan digere, di nav du keviran de deh quruşan dibîne. Bêguman pê kêfxweş dibe, lê pê çi bikire çi nekire, difikire hê jî nikare ku biryara xwe bide.

Dibêje, "Ger tirî bikirim gwêşiyê vala dimîne, erikan bikirim dendik dimîne, goşt bikirim tifik nîne, giya bikirim kêr nîne. Ya baş ew e ku nokan bikirim, ne serê xwe biêşînim, ne jî didanên xwe. Bi qasî ku dikarim dixwim, yê man jî dibim ji dayîka xwe re."

Nokên xwe dikire û dikeve rê. Diçe û bi rê de nokên nû diavêje devê xwe. Virde wêde diçe û digihe ser bîrekê.

Di bîrê de av heye lê kûr e. Hinekî xwe bi ser bîrê de ditewîne daku lê binêre ka ava bîrê çawan e? Gelekî li jêr e? Nêzik e? Lê avê nabîne. Hinekî din xwe ditewîne, vê carê jî nîv nok dikeve bîrê. Dema nok dikeve, aqilê Lawikê keçel, ji serê wî diçe.

Lawikê keçel: "Herê bîrê bîra reş, tu dilopek av ji min re zêde bibîne, piştre jî bê dest û ling were nokêji min bistîne. Wele baş e, ji ku tê ev bêedaletî. Heydê noka min bide min, ger tu nedê, ez serê te jî, kevirê te jî bişkînim." Dema deng ji bîrê dernakeve ca-

reke din dubare dike, disa deng dernakeve, cara sêyem dêwek ji birê derdikeve û dibêje:

"Tu çi dixwazî Lawikê keçel?"

"Ez ê çi bixwazim, noka xwe dixwazim"

Dêw: "Lawikê keçel, niv noka te di şahiya periya avê de bû çerez, hê jî dixwin, neqediya ye, lê hinek jê kêm bûye. Li şûna wê ez sifreyeke xwarinê didim te. Dema te got "vebe", vedibe her tiştekî xwarinê tê ser û têra te û yên din jî dike. Dema te xwarina xwe xwar, dibêjî "were girtin" tê girtin. Dêw piştî vê axftinê dike wenda dibe.

Lawikê keçel; "Li qismet binêre, mirov nizane kengî tê dikeve kevçiyê mirov." Û sifreya xwe dide hev, berê xwe dide rêya malê.

Diçe malê dayîka wî tê pêşiyê û dipirse: "Dîsan xêr e Lawikê keçel! Maşeleh te li cih e."

Lawikê keçel, hinekî dikene, axaftina dayîka xwe di qirka wê de dihêle û dibêje: "Vebe sifreya min vebe" yekser sifre vedibe ku sifreyeke gelekî dewlemend e. Hemû awayên xwarinê, şîranî... Vê carê jî dayik ji kêfa dike bifire. Bi ken û dilxweşî li ser sifrê rûdinin. Dixwin, vedixwin naqede. Lawikê keçel dibêje, "Were girtin" sifre tê girtin û radibe.

Rojek, du rojan, sê rojan... Lawikê keçel dibêje, "vebe" sifre vedibe, dibêje "were girtin" sifre tê girtin. Ne agir e, ne êzing in, ne tifik e, ne jî kevçi ne. Qet tiştekî naxwaze.

Rojekê ji rojan Lawikê keçel, ji dayîka xwe re dibêje: "Dayê em carekê jî cîranan dawetî ser sifrê bikin, çawan dibe? Dayik dibêje; "Kurê min, em dikarin dawet bikin, lê li her derekê her çavek heye, ger me çavînî bikin? Disa jî tu dizanî.

Temaşe dike ev axaftin ne bi dilê Lawikê keçel e, ma'dê xwe tirş kiriye û lêva bostekê hatiye xwar. Dayik dibêje: “Tu li xwe binere, her tiştêk jî dibe, ez têr û birçiyê parîk nan im.”

Lê Lawikê keçel dîsan jî deng nabe xwe û dibêje: ”Temaşe ke li çi difikire!” û diçe li derdorê ji hemû cîranan re dibê je werin ser sifreya min. Ji dayîka xwe re dibêje, “Bila werin, nanê min bixwin ku hikum û qedrê min bizanin.”

Heta êvarê gund hemû agahdar dibe. Kesên ku zana û rewşa Lawikê keçel dizanin, dibêjin, “Lawikê keçel ne tifika te heye, ne tiştekî din. Tu çawa dikarî hevqas mirovan têr bikî?”

Lawikê keçel dibêje; “Her kes qismetê xwe dixwe, mêvan ne tişta dixwazin lê tişta heye dixwin, çi ket keviçiyê wan ew e. Bê guman yên ku têr rûnin, birçî jî ranabin.”

Lê belê li her derekê mirovên wiha hene ku, ji her gotinekê bawer nakin. Ji bo daweta Lawikê keçel jî dibêjin; “Lawikê keçel heta niha ji xwe re tiştek nekiriye, nedikarî zikê xwe têr bike, wê çawan me têr bike?” Ji bo wê jî guh nedidanê. Lê hinekan jî digotin: “Dibe tiştekî din di bin vê daweta Lawikê keçel de nebe lê gelo dîsan jî em herin bibînin?” Meraq dikin, zikê xwe têr dikin û berê xwe didin mala Lawikê keçel.

Diçin mala Lawikê keçel ku çi bibînin? Sifreyeke dewlemend raxistiye, hemû ke jê dixwe lê naqede. ŞÎvan tên dixwin û diçin ber pezê xwe, zarok tên dixwin û dîsan diçin dileyizin. Lawikê keçel dibêje, “vebe” vedibe û tê raxistin, dibêje, “were girtin” tê girtin û radibe.

Her kes tên, dixwin, di nav xwe de nîqaş dikin û dibêjin “ev çi sifre ye?” Hinek dibêjin “sifreya baweriyê ye,” Hinek dibêjin “sif-

reya keremetan e." Lê navê wê wek "Sifreya Lawikê keçel" tê nasîn.

Yên ku tên ji sifrê dixwin bi hev re vê duayê dikin û dibêjin: "Van diranan çi xwarin, ne bûn zêr ne jî zîv. Ey Xwedayê erd û ezmanan, tu sifreyeke wiha bide me jî."

Rojekê ji rojên di dawetekê de tiştêk tê serê Lawikê keçel ku qet nehatiye serê kesî. Sifre radibe û wenda dibe. Lawikê keçel, serê xwe dihejîne, li serê xwe dide, çi dike sifre naye. Dayîka wî serê xwe dihejîne û jê re dibêje; "Kurê min, min ji te re gotibû, her çavek nabe yek, tirsa me hat serê me, ka lê bigere tu dikarî bibînî? Êdî ez karê xwe dizanim, çi halê te heye ti bi xwe çareser bike." Disan diraje teşiya xwe û hiriya xwe dirîse.

Lawikê keçel dibêje: "Ka ez ji derdoran bipirsim" û ji her deriyekî ku rastê tê dipirse. 'Qebahet ya bûkê ye lê kesî neavêtiye ser kurê xwe!' Kes guhê xwe nade Lawikê keçel. Her kes diavêje ser yekî din. Tê gotin ku dibe "Xalê kevnefiroş biribe" Êdî yekser diçe serê çiyê ba kevnefiroş.

Kevnefiroşê pîr dibêje: "Pêwistiya min bi kesî nîne, ez bi dest û keda xwe jiyana xwe derbas dikim. Dibe ku dayîka Fatê biribe."

Lawikê keçel, diçe cem dayîka Fatê. Lê ew jî dibêjeİ "Helawa qudretê li ba min heye, fêkiyê sebrê li ba min hene, çavê min ne li malê ti kesî ye."

Mirov dikare bi kurtî bibêje, erd bûye hesin, ezman bûye bafûn, kesek di nav du tiliyan de sifreyê dibin û dernayên. Lawîkê keçel jî, serê xwe yê keçel dixwerîne û dibêje; "Ne wî bir, ne jî vî bir, ku kiribe disan wanev kar kiriye." Piştre dikeve ser rêya bîra bisêhr...

Ew diçe rê diçe, siya wî jî li pey tê û ber êvarkî digihe ser bîrê û jê re dibêje:

"Ey bîrê bîra reş, te çi kir? Ez di xewde bûm, dayîka min şiyar bû. Te cin û periyên xwe şandin sifre anîn? Ma dibe? Yekê bide, yekê bistîne? Ew taybetiya Xwedê ye. Eger tu bazareke tund dixwazî, wê demê noka min bide, sifreya xwe bibe."

Carek dibêje, deng ji bîrê dernakeve, carek din dibêje disan deng jê dernakeve. Cara sêyem dêw derdikeve û dibêje: "Te xêre, çi dixwazî Lawikê keçel"

"Ez ê çi bixwazim, ya noka min an jî sifreya ku te dabû min. Herweha ji wê rojê heta îro têrnaxwim, nanên dayîka min jî wek destê min biçûk in, têra min nakin. Ez bi destên vala, rûyekî reş nikarim bizîvirim malê!"

Dêw: "Lawikê keçel, neke pite pit, nîv noka te li dawet û şahiyan çû. Ya ku maye jî ji periya avê re bû çerez. Vê carê min ji te re aşek anî. Ev aş aşekî wihe ye dema rast dizîvirînî zêr derdixe, çep dizîvirînî zîv derdixe. Têra îro jî, sibe jî, cejnê jî û dahatû jî dike. Qewet be ji destên te re. Tu çiqa bikarî bizîvirînî hewqasî dide." Dêw piştî van gotinan dike, winda dibe.

Lawikê keçel dibêje: "Xwiya ye evna jî di qederê de hebû" û aşê xwe li pişta xwe dike, berê xwe dide malê.

Dema digihe malê, dayîka wî careke din ji serî heta bini li wî dinêre û dibêje, "Ew çi ye? Lawikê keçel, dîsa çavên te dikenin, te çi kir?

Lawikê keçel; "Tu aniha dibînî çi dibe! Tu du tûrikan ji min re bîne."

Diya wî radibe li malê dinêre, du tûrikên kevn dibîne û jê re tîne. Yekî çil pîne, yekî din jî çil qul têde ne.

Lawikê keçel radibe, xwe dişidîne û li ber aş radiweste. Ji aliyekî ve zêr, ji aliyê din ve zîv tên der. Dayîka wî destpêkê ji çavên xwe bawer nake, lê hêdî hêdî fêr dibe û bi maşallah û înşallah çav û lingên şeytan girêdide.

Lawikê keçel, rojek, du rojan, sê rojan... Bi şev, bi roj kar dike. Destê rastê diweste bi destê çepê, dema li ser piyan diweste rûdine û dîsan bi vî alî û wî alî de dizîvirîne. Dayîka wî jî zêr û zîvan berhev dike, dixe tûrik, kûp û sindoqan...

Lawikê keçel ji ber ku mirovekî kêmaqil e, nizane qezenca xwe çawa xerc bike. Digere, tevlî şahîyan dibe. Herweha hefte derbas dibin, meh derbas dibin, rojekê dayîka wî pê dihese ku di tûrik û sindoqan de ne zêr û ne jî zîv in. Jinik diçe cem kurê xwe ku di xewa nîvro de ye. Ketiye xeweke kûr û giran, pix pixa wî ye. Bangî dike, carek ducar... Lê, şiyar nabe. Mûyekî dişewitîne û carek du caran li pozê wî dide êdî şiyar dibe.

Dayîka wî dib^je; "Lawikê keçel, haya te ji te heye ku te çi kiriye?" û yek û yek hemû tiştî jê re dibeje. Lawikê keçel li serê xwe dixe, dîsan serê xwe dixwerîne û dibêje:

"Ka berê xwe bide dayikê, çi ji xwe re dike derd? Ez ê niha te li zêr û zîvan dixerbilînim, tu aşê min ji min re bîne! Dayik, aşê wî tîne li cem datîne. Lawikê keçel, destê xwe diavêje aş, rast dizîvirîne nabe, çep dizîvirîne nabe. Temaşe dike ku aş zingar girtiye, çi dike kar nake.

Lawikê keçel şaş dimîne. Serê xwe yê keçel carek, du caran, sê caran dixwerîne û dibêje; "Ev ne karê cinan e, ne jî yê şeytanan.

Disa karê vayên di bîrê de ye." Radibe carek din berê xwe dide bîra bisêhr.

Kêm zêde diçe, diweste dizîvire li pey xwe dinêre ku hê nû gavekê çûye. Yekser li wir siyekê dibîne û li ber wê siyê radize. Piştî wextekî dûr û dirêj, şiyar dibe çavên xwe vedike ku wî li ser bîrê, li ser kevirekî ye. Hê ku bêhna xwe bernedaye û xwêdana xwe paqij nekiriye bangî bîrê dike:

"Ey bîrê bîra reş, te aşek da min, ava wî nîne. Rast dizîvirînim nagere, çep dizîvirînim nalive. Ya vî aşî biguhure, yan jî noka min dîsan bide min."

Carekê dibêje disekine, careke din dibêje disan deng nayê, piştî cara sêyem dêw derdikeve ku vê carê, lêvek li erdê ye, yek li ezmanan.

Lawikê keçel, dema dêw dibîne, ziravê wî diqete, devê wî nagere. Ne dikare bibêje "no" yan jî "no". Ne dikare bibêje "av" an jî "aş"

Lê belê dêw dibêje: "Lawikê keçel, zêde neke pite pit. Min ji te re doqikek anî, lê çi doqik e. Ji bo yên ku neheqiyê dikin, tu dibêjî 'lêxe' lêdixe, tu dibêjî 'raweste' radiweste." Û wenda dibe û diçe.

Lawikê keçel dibêje; "Xwiya ye ku di qederê de doqik jî heye." Radije doqikê xwe û berê xwe dide rêya malê. Tê dema ku dikeve hundir, diya wî dibêje: "Dîsa te çi anî? Tu yê wî jî di çar penc rojan de wenda bikî. Ey kurê min ê bêaqil, aqilê te bi ku de çû? Çima ti ji xwe re karekî rast û dirûst nakî?"

Lawikê keçel, bi van gotinan aciz dibe û dibêje: "Tu niha dibînî, 'lêxe doqikê min lêxe' ku wiha dibêje, doqik radibe û li

serê keçel dikeve. Lawikê keçel dibêje “raweste,” lê doqik nabihîze. Dewam dike û li ser serê keçel radibe û tê xwarê. Serê wî gelekî diêşe, dengê doqik û giriyê keçel tevlîhev dibe, di vê tevlîheviyê de Keçel dîsa dibêje; “raweste, raweste” Lê vê carê jî doqik ‘ranaweste’ wek ‘lêxe’ fam dike û hê jî zêdetir li serê Keçel dikeve. Piştî bîstekê êdî hal di Keçel de namîne. Bi awayekî dike hewar û dibê ‘raweste’. Vê carê doqik dibihîze û radiweste.

Dayîka wî li ber tifikê, berê xwe dide vê rewşê. Ji xwe re dibêje; “Ji serê bêaqil re ev doqik jî kêm e.” Ne dikare bigirî, ne jî dikare bikene.

Lawikê keçel ji vê tevgera diya xwe aciz dibe û ji doqik re dibêje: “Carekê jî li vê jina ku dibe dayîka min “lêxe”, lê deng ji doqik dernakeve.

Piştî vê, Lawikê keçel her tiştî fam dike. Rast e, tawanê mezin yê wî ye. Sifre, wî wenda kirîbû, aş wî zingarî kirîbû. Yekser diçe xwe diavêje dest û piyên dayîka xwe. Dibêje; “Dayîka min, canê min, min kir ti neke” û li ber digere.

Wek tê gotin “xoşewîsteke wek dê nabe” disan rast derdikeve. Dayik, kurê xwe efu dike, li cem rûdine û şîretan lê dike: “Ey kurê min, ciwanê min, mar bi maritiya xwe qena’eta xwe bi axê tîne. Pêwist bû te mar wek mînak werbigirta. Lê te hemû xelk li xwe cÎvandin, baweriya te bi tiştekî nehat. Ger te wiha nekiriba sifre heta hetayê jî besî me bû. Lê disan jî dilê Xwedê bi te şewitî û aş şand. Te tiralî kir ew jî zingarî kir. Ger te kar bikira ma ew zêr û zîv têra çî me nedikirin? Destê rastê westiya, te bi destê çepê bigeranda, niha mala me bi zêr û zîvan tije bûbû. Ne xirab dibin, na jî zingarî.”

"Poşmaniya dawiyê pere nake, lê dema doqikeî wiha li serê te ket belkî aqilê te were serê te. Piştî vêna yan tuyê bi yên Xwedê daye qena'et bikî, yan jî ger te karêk kir tuyê li gorî w karî kar bikî. Ger rojekê nebî xwediyê aşekî daran? Li ber jî, tu dikarî bibî stuna mala min."

Dema şîret tên kirin kî wernagire, heta Lawikê keçel wernegire! Dibêje şîretên dayîkan, dayîka şîretan e û yekser diçe karêkî xwe yî zehmet dibîne. Bi şev û roj kar dike. Ne wek zêr û zîvan ne, lê pereyekî baş qezenc dike. Li mala wan disan sifre tê raxistin, lê ne dêw radixe, ne jî kesên din berhev dikin. Dayîka wî radixe û berhev dike. Zêr û zîv wek berê naherikin mala wan. Lê bi perên xwe zêrekî çêdike, herkesek heyran dimîne. Ew digihin mirada xwe. Bextê wan bila bibe para me...

ꙮ ꙮ

## AQİL Û BEXT

Rojekê bext dibîne ku, Aqil li ser kursiyêkî di nav baxçe de rûdiştiye. Diçe jê re dibêje; "Ji vir rabe!" Aqil guh nade gotina Bext û jê re dibêje:

"Ji bo çi guh bidim te? Tu ji min nebaştir î."

Bext bersiv dide: "Em dibînin, her mirovek mastxwarineke wî heye. Tu wî lawikê li vê zeviyê cot dike dibînî? Eger tu bikarî aqilê wî jê bistînî, ez te li ku bibînim, ez ê rêzê lit e bigirim."

Aqil vê pêşniyarê qabûl dike û diçe dikeve serê lawik. Ku ket serî, lawikê gundî dest bi fikirandinê dike û vê pirsê ji xwe dipirse: "Niha ez neçar im heta hetayê vê zeviyê biajom? Ez ê herim cihên din rêyên ku zûtir dewlemend bibim bigerim."

Lawikê cotkar, yekser dest ji cot berdide, haletan bicîh dihêle û raste rast tê malê. Ji bavê xwe re dibêje; "Yavo ez naxwazim heta dawiya temenê xwe gundî bimînim. Ez dixwazim bibim baxçevan."

Bav: "Vanek! Çi bû? Tu har bûyî? Lê piştre difikire ku jiyan a wî ye, çi bixwaze dikare wê bike. Jê re dibêje, "Xwedê te biparêze! Ji niha û şûnde êdî xwediyê mîrata min birayê te ye" û wî bi rê dike.

Vanek, êdî malê ku ji bav jê re bimîne wenda dike. Lê ne xema wî ye. Piştî çend rojan dibe baxçevanê Şah. Serokê bexçevanan zêde tiştan fêrî wî nake. Lê disan jî Vanek, fêrî gelek tiştan dibe. Piştî zemanekî êdî Vanek li gor zanabûna xwe xizmeta bexçe dike. Serokê baxçevanan destpêkê razî nabe, lê piştre dibîne ku xizmetwkw baş dibe, deng nake û ji Vanek re dibêje; "Dibînim ku tu ji min biaqiltir î" û hêdî hêdî bexçe jî teslîmî destên bi huner ên Vanek dike.

Vanek, di demeke kurt de bexçe xweşiktir dike. Şah û şahjin ligel keçika xwe tên li nav bexçe digerin û zêdetir kêfa wan jêre tê.

Keça Şah, keçeke gelekî xweşik bûye. Lê ji temenê bîst salî û vir ve lal bûye û qet kesekî peyvek ji devê wê nebihîstiye. Şah ji bo wê gelek xemgîn dibû. Lewra jî digot, eger kî bikare zimanê keça min veke, ez ê keça xwe bi wî re bizewicînim. Vêca, heta wê demê jî gelek kesên wek şah, şahza... hatine bo vekirina zimanê keçikê lê serkeftî nebûne.


Vanek, ji xwe re difikire û dibêje: "Ji bo çi ez carekê bextê xwe neceribînim? Belkî keça Şah bersiva pirsên min bide." Radibe raste rast diçe koşka Şah. Şah û şêwirmendên wî Vanek dibin odeya keçikê.

Kuçikekî biçûk ê keça Şah hebû. Keçikê jî gelekî jê hez dikir. Ji ber kuçikekî gelekî biaqil bûye û ji keça Şah jî baş fêm dikir. Dema evna dikevin odê, Vanek berê xwe nade keçikê û rast diçe cem kuçikê keça Şah. Ji kuçik re dibêje: "Min bihîst ku tu kuçikukî gelekî biaqil î. Ez hatim ku tiştekî bi te bişêwirim."

"Em sê heval bûn, me seferek dikir. Yek peykersaz bû, yek terzî bû, yek jî ez bûm. Carekê di daristanekê de şev li me bû tarî û em ji neçarî li wê man. Me agirekî mezin pêxist, ji bo ku agir venemire jî bi rêzê em li benda agir man. Rêza yekem, ya peykersaz bû. Peykersaz ji bo ku demê baş derbas bike, ji darekê peykerê keçikekê çêkir. Heta ku peyker qediya, terzî rabû û ji peykersaz pirsî, "Te di dora xwe de çi kir?" Peykersaz got, "Min ji koka darê peykerê keçikekê çêkir, ger tu bixwazî tu jî dikarî cilubergekê jê re çêkî." Terzî, meqes, derzî û deziyên xwe derdixe, qumaşê xwe dibire û cilekê ji peyker re didûre. Dema hazir bû dibe li peyker dike. Piştre tê min radike. Ez rabûm ku peykerekî bi cilûberg li hemberî min e. Min got, "Evna çiye?" Heval got; "Peykersaz ji koka darê peykerê keçikekê çêkir, min cil lêkirin, ger tu jî dikarî wê fêrî axaftinê bike. Min jî ew fêrî axaftinê kir."

Ku bû sibe herdu hevalên din jî rabûn. Me herkesek dixwest ku peyker bibe ê me. Çunkû yêkî çêkiribû, yekî cil lêkiribû, min jî fêrî axaftinê kiribû.

"Kuçikê biçûk, niha bibêje pêwist e ku peyker bibe yê kê ji me?"



Bê guman kuçik nikariye bersivekê bide, li şûna kuçik, keçika Şah bersiv dide û dibêje: "Pêwiste peyker bibe yê te. Ji ber te zimanek û canek daye wî, terzî cilek jê re dirûye lê bê can û bê ziman cil ji tiştekî re nabe. Mafê xweditî yê te ye."

Piştî ku keçik diaxife, şêwirmendekî Şah ji Vanek re dibêje: "Şahê birêz wê xelateke mezin bide te, ji bo ku te ew fêrî axaftinê kir. Lê, te bi wê re nazewicîne. Ji ber tu kurê gundiyekî ji rêzê yî." Tê zanîn ku şah jî wiha difikire.

Lê Vanek, ji xeynî bi keçikê re bizewice, nêta wî ya ku xelateke din qebûl bike nîne û dibêje: "Şah soz daye ku kî keça wî fêrî axaftinê bike, ew keça xwe bi wî re dizewicîne. Soza Şah yasa ye, eger Şah dixwaze rêz li yasayan bê girtin, dive pêşî ew li ser soza xwe bimîne û keçika xwe bi min re bizewicîne."

Şêwirmendê Şah diqîre û dibêje: "Wî xwe nenasî bigrin û girêdin. Her kî hewl bide aqil bide Şah, tê wateya li dijî Şah derketiye. Cezayê vêna jî kuştin e. Şahê birêz, desturê bide daku ev xwe nenas bi şûr bê kuştin."

Şah dibêje, "Na, dive bê darve kirin."

Vanek, yekser li wir tê girêdan û ji odeya keçikê tê derxistin û dibin cihê darvekirinê. Vêca dema dibin ber sêdarê, Bext li wir e û ji Aqil re dibêje: "Te dît? Bi rêya te de çû niha wê bê darvekirin. Êdî rê bide daku ez werim şûna te."

Bext ku dikeve serê Vanek, sêdar dişike û parçe parçe dibe. Heta ku sêdareke din çêkin, dibînin mirovek di dest de alayeke spî dihejîne, tê û dibêje, "Ez ji koşkê têm, ji bo ku Vanek neyê darvekirin."

Baş e, çi bû ku Vanek ji darvekirinê azad bû? Keça Şah ji Şah re dibêje: "Gotina Vanek 'soza Şah yasa ye' rast e. Vanek, ger gundî be jî, Şah dikare wî bike Şahzade."

Şah, gotina keça xwe maqûl dibîne û dibêje, "Tu gelek rast dibêjî, em dikarin Vanek, wek Şahzade îlan bikin."

Herweha ji bo ku Vanek bînin koşkê, otomobîlekê dişînin û ew şêwirmendê ku gotibû; "Bila Vanek bê darvekirin" jî li şûna Vanek tê darvekirin.

Piştî van hemû tiştan, Vanek û keça Şah ji bo ku herin şahiya xwe li otomobîlekê swar dibin û birê dikevin. Aqil li ser rê radiweste û dibêje, "Bext ji min zidetir alikariya Vanek kir. Ji bo vê jî rêzê lê digrim û ez ê her dem rê bidim wî." Piştre jî ku çend caran rastî hev tên, Aqil rê dide Bext û rêzê lê digire.

৯ ৩

## AGİR DİZÎNA XALMİŞK

Tê gotin ku wextê agir ji stêrk û ezmanan hat xwarê, jinêk pîr hebûye. Jin bê tirs û wêrek bûye. Diçe agir li cihê ku ketiye werdigre û zemanekî dûr û dirêj vedişêre.

Piştî zemanekî mirov biryarê didin ku agir ne tenê yê jinê ye, yê hemû mirovan e. Diçin mala pîrê û agir jê dixwazin. Pîrê, gelekî ser hişk bûye, nexwestiye agir bide kesekî.

Zeman derbas dibe, roj û meh dibuhurin lê jina pîr agir li cem xwe vedişêre, nade tu kesî. Rojek xalmişkek derdikeve û ji mirovan re dibêje: "Ez xalmişk, ger hun soz didin ku careke din min naxwin, ez soz didim agir ji we re bînim."

Hemû kes henekê xwe bi xalmişk dike, lê ew li ser xwe bersiva wan dide: "Dev ji henekan berdin, wiha hûn bi xwe dibin henek, hûn îşev dibînin ku ez soza xwe bi cîh tînim."

Dema dibe êvar xalmişk mal bi mal digere û ji her kesî re dibêje, ez îşev agir tînim, kî çiqas agir dixwaze dikare bibe xwediyê wî. Dawî jî diçe mala pîrê. Ji pîrê re dibêje: "Êvar baş

pîra agir, min gelek sare, dikarim hinekî xwe li ber agirê te germ bikim." Pîrê, bawer dike û dibêje: "Tu dikarî hinekî xwe germ bikî." Xalmişk, xwe dixe quncika agir û tiriya xwe dixe bin agir, agir bi teriyê pêdikeve û dişewite, xalmişk yekser radibe derdikeve, tiriya xwe li qirş û daran dide wan jî pêdixe, her der dibe agir. Loma jî qet pirç bi tiriya xalmişk ve nîne.



ꕥ ꕥ

## DUDİLİYA XALMİŞK

Ev çîrok çîroka dapîra 'Jackie Torrence' ye. Dapîra wî dema li ser xiyaneta hevalan tiştek digot, ev çîrok wek mînak nîşan dida. Digot çîrokên wiha min rehet dikin.

Ajal, di serdemên berê de diaxifîn. Di wan serdeman de xalmişkekî pîr hebû. Hevalekî baş bûye. Ji bo çi? Ji ber nexwastiye ku serê tu kesî bikeve belayan. Her wext ji hinekan re alîkarî kiriye.

Her şev diçû ser dareke xurma, xwe bi guliyên wê de berdida xwarê wiha radiza heta sibê. Sibehan dadikeve ser rê xwe dide ber tavê û dimeşe.

Disan sibehekê li ser rê dimeşe dibîne ku kunikeke mezin li ser rê ye. Belê, xalmişk kesekî dilxweş û narîn bûye. Û gelek jî bi meraq bûye. Ji bo wê jî çûye berê xwe daye kunikê. Dibîne ku di kunikê de birayekî mar heye û li ser pişta wî jî xiştek heye. Yekser paş de dizîvire, Hinekî dûr dikeve. Hinekî difikire û dibêje: "Divê ez ji vir dûrkevim, ji ber birayê mar bêbext û xayîn e." Bi rê

dikeve ku biçe, dengê nalîn û hawara mar tê, xwiya ye mar, wextekî li kunikê dinêre wî dibîne. Mar dibêje: "Alîkariya bi min bike birayê xalmişk." Xalmişk, dema deng dibihîze, ji ber kesekî xêrxwaze dilê wî pê dişewite û paş de dizîvire diçe ser kunikê, berê xwe dide kunikê û dibêje: "Çi ye birayê mar, te bangî min kir, çi dixwazî?" Mar: "Erê birayê xalmişk, wek tu jî dibînî xiştek li ser pişta min e, ez nikarim ji kunikê derkevim, bi xêra xwe wî xiştî rake." Xalmişk difikire û dibêje: "Birayê mar guh bide min, ez te dinasim, tu kesekî rezîl, xayîn û bêbextî, ger ez werim kunikê, tê min vedî."


Marê bi sal, fişênî pê ket û got: "Tu çi dizanî, belkî ez bi te venedim jî, belkî ez bi te venedim jî, belkî ez bi te venedim jîîî.

Birayê xalmişk got: "Bi rastî baweriya min bi te nîne, lê disan jî bo bifikirim hinek zeman ji min re divê." Xalmişk dema difikire, li ser darekê çiqlekî hişk dibîne. Yekser diçe wî çiqlî jê dike, bi wî çiqlî xişt ji ser pişta mar radike û disan rêya xwe berdewam dike.

Xalmişk dema hinekî jê dûr dikeve, disan dengê hawara mar tê: "Birayê xalmişk alîkariyê bi min re bike." Disekine, ji xwe xwe re dibêje: "Ax, na, disan ew e" Lê ji bo ku xêrxwaze, disan dizîvire diçe ser kunikê, li wir radiweste û dibêje: "Birayê mar, yê ku bangî min kir tu yî? Niha çi dixwazî?"

Fişênî bi marê bi temen dikeve û dibêje: "Ez ji zû ve li vir im, qels bûme, nikarim derkevim. Tu dikarî min bikşînî jorê?"

Xalmişk difikire û dibêje: "Deqîqeyekê li benda min be, ez werim cem te, tê bi min vedî." Birayê mar disan fişênî pê dikeve û dibêje: "Tu çi dizanî, belkî ez bi te venedim jî, belkî ez bi te venedim jî, belkî ez bi te venedim jîîî..."



Birayê xalmişk dibêje: "Nizanim, ji bo bifikirim pêwistiya min bi zeman heye." Xalmişk dema difikire, dibîne ku ew darê hişk di kunikê de ye. Wî darî dixe bin mar û mar dikşîne derve, diavêje nav giyayên dirêj û bi rêya xwe de diçe.

Xalmişk, dixwaze ku bibêje ez jê dûr ketim, disa dengê hawara birayê mar tê. "Birayê Xalmişk alikariya min bike."

Xalmişk: "Ev disa ew e" Ji bo ku gelekî xêrxwaze, nahewe disan dizîvire ser kunikê, dinêre ku mar hêdî hêdî li nav giyayan dimeşe.

Mar, dimeşe diçe aiyê din ê rê, li xalmişk dinêre û dibêje:

"Ez gelekî di kunikê de mam, min qet tav nedît, gelekê bêhalim, westiya me, Tu dikarî min bixî berîka xwe û min piçekî germ bikî?"

Xalmişk: “Birayê Mar, guh bide min, ez bi te dizanim, tu kesekî xayin, bêbext û bênamûs î. Eger ez te bixim berîka xwe, te yekser bi min vedî.”

Mar disa dike fişefiş û dibêje: “Tu çi dizanî ku ez ê bi te vedim? Belkî ez bi te venedim jî, belkî ez bi te venedim jî, belkî ez bi te venedim jîîî.”

Xalmişk: “Na, na, birayê Mar, ez te dinasim, ez pêşniyara te qabûl nakim.”

Xalmişk, wiha dibêje, lê belê dilê wî jî bi Mar dişewite. Ji ber Mar li hemberî bi şêweyekî mazlumane radize û lê dinêre. Sebra Xalmişk nayê û dibêje: “Baş e, qabûl dikim, lê tenê carekê ji bo ku tu germ bibî, te dixim berika xwe” û dixe berîka xwe. Birayê Mar qet deng nake. Bîstek derbas dibe, mar piçekî germ dibe, fişênî pê dikeve û dibêje:

“Birayê xalmişk, ez bi te vedidim.” Xalmişk: “Ka raweste, çima tu bi min vedidî? Min xişt ji ser pişta te rakir, min tu ji kunikê derxist û min tu kirî berîka xwe û germ kir, çima tu bi min vedidî?”

Birayê Mar: “Lê wextê te ez xistim berîka xwe, te dizanî ku ez mar im.”

Jiyan wiha ye, ger tu li ser karûbarê xwe yî, rastî kêşeyekê jî hatî, heta ew kêşe derdekî ji te re çêneke pê ve mijûl nebe-guhê xwe nediyê.

## GURÊ ÇOLÊ MİROVÊ SPÎ DİXAPÎNE

Çîrok her wext ji bo demeke baş bê derbaskirin nayên gotin. Carna jî rolê çareseriya pirsgirêkên civakî werdigirin. Wek mînak, li kultura reşikên Amerîkayî de, rêyên serhildanê nîşan didin. Dema mirovên spî li Amerîka zêde dibûn ji bo çermsoran dibûn metirsî, çîrokên çermsoran jî vî rolî dibînin. Ev çîrok jî çîrokeke wiha ye.

Gurê çolê, rojekê ji xwe re bi rê de dimeşe, dibîne ku ji beramberî ve swarekî tê. Swar dema nêzik dibe gur dibîne ku evna miroveki spî ye. Difikire ka dê vî mirovî çawan bixapîne.

Swar gur îşaret dike û dibêje: "Ez li gurê çolê yê herî jîr digerim, yê ku dikare hemû kesan bixapîne. Nebe tu ew bî?

Gurê çolê dibêje, "Na, ne xêr, ne ez im" Lê swarê spî bi israr dibêje; "Ew ê ku van mirovan dixapîne tu yî." Gurê çolê jî her tim dibêje; "Ew gur ne ez im" Swarê spî; "Heydê zû, min bixapîne, çîrokekê çêke."

Gurê çolê, “Ax, ez ne tiştekî wiha me, tenê mirov wiha bangî min dikin.”

Swarê spî; “Ez te dinasim, were em bikevin kêbirkeyekê.”

Êdî Gurê Çolê aciz bû û got; “Erê, raste ew ez im, lê dermanê ku min pê mirov dixapandin li malê ma. Mal jî li rojava ye, li dûr ma. Çûn û hatina min zemanekî dirêj digire”

Swarê Spî, “Rabe, here bîne”

Gurê Çolê, “Ez gelekî westiya me, ji rêyeke dûr û dirêj têm. Ger tu kêbirkê dixwazî wê demê hespa xwe bi deyn bide min, ez ê herim dermanê xwe bînim.”

Swarê Spî, ji hespê tê xwarê, dibêje, “Baş e ji te re hesp û here bine”

Gurê Çolê, bi dizika darekî biçûk ji erdê radike û tê cem hesp û li hesp dixe. Hesp ditirse û hinekî dûr dikeve. Gurê Çolê dibêje, “Binêre hespê te min qebûl nake, ji ber ku şivqa min nîne.”

Swarê Spî, şivqa xwe ji ser serê xwe derdixe, dide wî û dibêje; “Ha ji te re şivqe here.” Gurê Çolê, şivqê dideyne ser serê xwe û wek lê swar be nêzikî hesp dibe, disa darê xwe li hesp dixe. Hesp disan vedicinique û dûr dikeve. Gurê çolê careke din li Swar dizîvire û jê re dibêje: “Tu dibînî hesp disan nahêle, xwedê zane çakêtê min nîne ji ber wê ye.”

Swarê Spî çakêtê xwe derdixe û didiyê. Gurê Çolê çakêt jî lixwe dike, diçe cem hesp bi dizîka disan darê xwe li hesp dixe, hesp vedicineke û dûr dikeve.

Gurê Çolê, disan tê cem Swar û dibêje, “Tu bi xwe dibînî, hesp nahêle ku ez lê swar bim, diyar e çeka min nîne ji bo wilo ye.”



Werhasil, Gurê Çolê, çek, pêlav, pantol jî bi heman awayî ji Swarê Spî distîne û Swar tazî dimîne.